



Makîneya şerê taybet li Zapê hate rûxandin

Berpirsa Al'yê Ozlem Dalkıran:

Divê aliyên şer li gorî
Peymana Cenevreyê tevbigerin
Rûpel 8-9


Deham Ebdulfettah:

Qasimlo ne Simko bû..
dîrokê çawan xwe şopand..?!
Rûpel 4-5

Nûçe:

Wê rojê dewlet li
Sêwazê li ser kar bû
Rûpel 6

NAVEROK



Azad Altun: Li Tekirdağê şeva piştgirîya HADEP'ê

7



Servet Yükselir: Çiroka Binefşa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî -III-

10



Çiya Mazî: Evîna Mele

12

Ji Xwendevanan

EZ beriya her tiştî ji karkerên rojnâmeya Azadiya Welat re silavên şoreşgerî dişînim û astengiyên li ber weşanên kurdî şermezar dikim; ez jî tevî kampanyaya standîna Azadiya Welat dibim û ji nîha û vir de ezê rojnâmeya xwe heta weşanê wê bîna domandin bistînim û bixwînim. Bi rastî bi derketina Azadiya Welat ez gelekî kêfxweş dibim. Ez wexta diçim bayiyên rojnâmeyan, ku ez Azadiya Welat di nav rêzên rojnâmeyê tirkên de dibînim, min ku baskê min çêbibin, ez dikim ji şahî û kêfxweşiyê bîfirim, ez karker im, karkerê îngelatê me.

Ez hêvîdar im hunê wê nivîsa min di Azadiya Welat, rûpela 2'yan de bibînin.

Yên ku ji Kurdistanê li metropolan belav bûne, ez dixwazim bi kurtî li ser wan bisekinim hevalno û kurdno, baş giraniya xwe bidin ser têkoşîna xwe, ev firsendê firsendeke dîroktî ye. Careke din bi destê kurdan nakeve, ji ber vê yekê em pir dûr mane û jiyana metropolên tirk me ji ser koka me bi dûr dixê ev ne jiyane, ev jiyana bê rûmetî û berbatî ye. Nêrtîna me ji doza me re pir sar e, em pir li dûr sekinîne hinekî xwe ber bi dozê bikişînin, ev azadî û xelasî ya me hemûyan e. Gelê kurd pêwîst e ku yekîtiya xwe bide avakirin, neyê jîbîrkirin ku Azadiya ziman, azadiya welat e.

REMEZAN ÜLKER/ AMED



Tevkujiya Sêwazê û provakator

SAMI TAN

Hefteya çûyî di salvegera xwe ya çaran de Tevkujiya Sêwazê bi awayekî girseyî hate şermezar kirin. Li Meydana Tandoğan a Enqereyê bi deh hezaran mirovên demokrat ev kirina hovane lanet kir. Em jî bi dil û can beşdarî vê daxwaza wan dibin. Lê li wir dîsa provakatorên kemalîst li ser kar bûn, alên tirkên bi ser çowên dirêj û stûr ve kiribûn, dixwestin bidin pêşiya girseyê, dema ew daxwaza wan pêk nehat, bi çowan êrîş birin ser endamên ÖDP'ê, bi vê yekê re derket holê ku wan bi çî mebestê ew al bi ser çowan ve kirine.

Tiştê balkêştir ew e ku di hemû mîting'ê meşan de polîs çowên bi pankartan ve berhev dikin. Ji ber vê sedemê gelek beşdar pankartên xwe bi ser borîyên elektrîkê ve dikin, da ku polîs pankart û alê wan bêçow nehêlin. Lê ji ber ku Partiya Perinçek bi wan çowan ala tirk ji êrîşên şoreşgeran diparêze, polîsan çow ji wan nestandibûn.

Ev bûyer bi serê xwe belkî zêde girîng xuya neke, lê di rastiye de ji bo fêmkirina Tevkujiya Sêwazê û rewşa alewiyan xwediyê wateyê taybet e. Lewre di dema tevkujiyê de jî heman hêzan bi nêzîktêdayîna xwe kesên olperest li hemberî gelê alewî tûj kiribûn. Bi vê kirina xwe jî bûbûn sedema qetlîamê. Lewre ev hêzên kemalîst hêvî dikin ku bi şerê alewî û suniyan xurt bibin. Divê bê zanîn ku xurtbûna wan xurtbûna rejîmê ye. Lewre ew jî dil û can girêdayî bîrdoza fermî (kemalîzm) ne.

Wisa xuya ye ku rejîm bi her awayî li pey qezengkirina alewiyan e. Gelek alewiyan jî digel ew qas kuştin û tevkuji ku bi destê rejîmê hatine serê wan, hêviya xwe ji rejîmê qut nekirine. Hê jî gelek kes piştvanîya partiyên kemalîst dikin, hêviya xwe bi artêşa ku gelek çaran pergalê wan belav kiriye ve girê didin.

Sedemên vê yekê hene, bi taybetî ji bo alewiyan kurd sedema sereke psîko-

lojiya şkestîbûne ye. Lewre dewleta tirk dema di dema Serhildana Dêrsim û Qocgiriye de kurd tîk birin, bi vê yekê nema ji bo ku gel ji aliyê bîr û ramanê bixe, çî jê hat kir. Mirov dikare bibêje ku dewleta tirk sîstema dewşirmetiye li ser kurdên alewî meşand, zarokên kurd li ser bingeha bîrdoza kemalîst ji nû ve perwerde kirin, ew jî çand û zimanê wan, ji nasnameya wan bi dûr xistin. Lewre jî îro kesên ku herî zaf dixwînin li Dêrsimê dijîn, lê kurdên ku herî zaf ji çand û zimanê xwe dûr ketine û bi tirkîyeke ji ya tirkên paqijtir dipeyivin jî dîsa dêrsimî ne.

Dewletê hê jî dev ji politikayê berne-daye. Hin çaran bi destê CHP'ê, hin çaran bi destê Vezîroglu, hin çaran jî bi destê Perinçek dixwaze wan teslim bigire. Heke pêwîst be dikare hin kesên din jî bi kar bîne. Dema êdî nikaribe bi wan bide bawerkirin ku ew tirk in, îcar wê cudatîyên mezhebî, zaravayî bi kar bîne. Hema bi tenê bila ew ji doza neteweyî dûr bikevin, êdî ji kîjan bîr û baweriyê dibin xem nake ji bo dewletê.

Lê rejîm kê bi kar tîne, bila bîne, gelê Dêrsim û Sêwazê bi saya şervanên xwe êdî bi doza xwe ya neteweyî dihesin. Wê tu çekên zengarî nikaribin rê li ser vê hişyarbûnê bigirin.

Başûr bi felsefeya Zîlanan rizgar dibe

AHMET HUSEYİN

Dîroka Kurdistanê ji aliyekî ve dîroka felsefeya xiyaretê ye. Heta beriya PKK'ê ev felsefe bi rihetî, bê ku tu hesabî bide, di hate jiyandin.

Çiqas xayîn ketine tengasiyê, ewqas jî hawara xwe gihandine dijminê Kurdistanê. Dibe ku wan hawaran carinan xwe rizgar kiribin. Lê, terzê PKK'ê hawara wan di qirika wan de hişt. Ji ber ku PKK'ê bi şerê rizgarî di pêşiyê de neynûkên ejderhayê mezin KT'ê şikand. Şeydayî heta dawî di nav KT'ê de da çêkirin û xurtkirin. Ji acizbûna van her du hirçan bi alîkariya DYA'yê xwestin ku şerê azadiyê di başûrê welatê de bidin fetisandin. Li hemberî vê plana fetisandinê gerilayên azadiyê ji her aliyê de amadekariya xwe li gorî perspektîfên Serokatîyê kirin, bi textîkên gerîla, bêyî ku werin listîka dijmin, şerekî dijwar û berxwedaneke mezin dan meşandin. Bi taybetî jî bi terzên Zîlanan derbeya herî giran li dijmin dan.

Mercên ku felsefeya Zîlanan tê de derket holê, ji van gotinên hevala Zîlan xweş tê diyarkirin: "Dijmin bi awayekî giştî bi ser me de tê, êrîşî me dike. Pêwîst e ku em jî, bi hemû hêzên xwe bi hêskirin de herin û em dijmin bidin pê bihesînin ku em bi biryardarî û bi bîr û bawerî berdêla azadiyê didin û xwe di vê rê de feda dikin."

Zîlan ne livbaziyeke e, felsefeyek e. Felsefeya bi binxistina nebaşîyan û xiyaretê ye. Di vê felsefeyê de windakirin nîn e. Her dem ji bo tunekirina neyar riya rast

Dîrok jî wisa diyar dike ku eger gelek bi xwe bawer be, ji xwîn rijandinê netirse û her tiştê xwe bixwe xizmeta azadiya xwe, ne gengaz e ku ew gel rizgar nebe. Lewre bi van livbaziyan re gel dibe xwediyê felsefeya mezinbûnê.

nîşanî şervanên azadiyê û gel dide.

Di dîroka berxwedana gelan de cara yekemîn e ku livbaziyan xwefedayî li dijî îxanetê tîk kirin. Li Vietnamê, Arnavût, Lubnan, Filistin û hwd. hemû li dijî dagirkeran hatine kirin. Lê di Kurdistanê de ev livbaziya ku di 17'ê gulana 1997'an de di biryargeha PDK'ê de hatiye kirin, çara yekemîn e ku li dijî xiyaneta hundir livbaziyeke wisa tê lidarxistin. Ev, rewşeke taybet e.

Bi vê livbaziye re felsefa têkoşînê bi giranî xwe li Başûr da rûniştandin. Ji ber ku fetisandina gel li ku hebe, li wir illeh felsefeya Zîlanan xwe dide xuyakirin û jiyandin.

Felsefeya Zîlanan, felsefeya yekbûnê ye.

"Yê ku pêwîstiya wan bi biratiyê, aştîyê, hezkirinê, evînê, mirovatîyê û xwe-rastiye hene, em in. Hewcedariya me bi van tiştan heye û em evîndarê wan in." (Zîlan)

Kes, arî hêza ku yekîti û azadiya gelê Kurdistanê nexwaze, ew parêzvanê felsefeya xiyaretê ye. Lewre felsefeya şoreşê; mirinê wekî jiyane dibîne, ji ber vê jî digihêje azadî û yekîtiya gel. Yanê serxwebûna xwe hazir dikin, paşê dibêjin qeder e. Belê, ev şerê ku nûnerê felsefa xiyanetê Mesûd dest pê kiriye, di eynî demê de

destpêka dawî ya wan e jî. Lewra şerê Tevgera Azadiyê, şerekî zanistî ye li hemberî her cure kevnepêstiyê ye.

Başûr bi felsefa Zîlan an rizgar dibe.

PKK jî destpêka têkoşîna xwe ve ji bo yekbûna Kurdistanê şerekî zanistî, neteweyî dide. Hevalê Mehmet Karasungur, İbrahim Bilgin û bi sedan şervanên azadiyê bi destê xayinan hatine şehîdkirin.

Gelê me wê di dawîya vî şerê giran yê ku li hemberî xiyaretê tîye meşandin de ji xiyaretê xilas bibe, heta wê bigihêje rizgarî û yekîtiya xwe jî. Ji ber ku dema kurdê darê werê kuştin û ji nava darê were avêtin, tu sedem, namîne ku ew dar sax nebe, geş nebe û xurt nebe.

Belê, livbaziya xwefedayî ya hevala Berîtan (Gülnoz Karataş) felsefeya xiyaretê di mejiyê sedan de da kuştin. Rihê pîs yê ku li başûr serwertiya xwe dikir, ji kokê ve da hejandin. Yê pey şopa wê, wan jî bi qasî mezinahiya wê jî dan nîşan. Şehîdên Hewlêrê yê livbaziya xwefedayî parçeyek ji xelqê ya berxwedana hevalê M. Karasungur û hevala Berîtan in. Ev xelqê ya berxwedanê alternatîfa îxaneta şolekerên Başûr in. Xwesteka şolekerên başûr alîkarî ji bavê xwe DYA û birayên xwe KT çiqas lewaz bê çare mane kiş dike. Belê, van livbaziyan dawîya felsefeya îxanetê anî û tîne.



Bi armanca qedandina şerê li Kurdistanê û pêkaniha aştiyê, trean aştiyê bi navê "Musa Anter" ji paytexta Belçîka Brukselê roja 26'ê gela-wêjê ber bi Amedê ve bi rê dikeve. Ev organizasyon li ser "Banga Hannoverê" ku di sala 1996'an de ji hêla 500 rewşenbîr û siyasatmedarên alman ve hatibû sazîkirin, pêk tê. Heta niha bi sedan kesî ji bo vê rêwîtiyê serî li organizasyonê dane. Treana Musa Anter wê ji 10 vagonan pêk were, piştî ku ji Brukselê bi rê bikeve, wê li rawestgehên ku li ser rîya trenê ne, wekî bajarên Koln, Mainz, Viyana û Sofiyayê wê hinek çalakî pêk werin û pişt re dê tren xwe bigihîne Stenbolê, ji wir jî dê di 1'ê rezberê de yanê di roja aştiyê de bigihîje Amedê.



Li Stenbolê, navçeya Esenyurtê, roja 27'ê pûşperê kesên ku piştî şahiya HADEP'a Esenyurtê, ji avahiyê derketin ji hêla cendirmayên qereqolê ve bi hinceta ku di destên wan de rojnameya Azadiya Welat û kovara Özgür Halk heye bi awayeke hovane têne binçavkirin. Kesên ku hatibûn girtin, piştî ku 6 rojan di binçav de man, derketin dadgehê û bûn hatin berdan. Ji kesên ku hatibûn binçavkirin Şevket Abukan belavkarê rojnameya me ye, kesên din xwendevanên rojnameyê Nurettin Demir, Ali Yılmaz, Arzu Demiral, Sakine Akdağ, Hamdi Gökçek, Arif Erol, Fesih Doğan, Ayhan Aydemir, Levent Boğa, Eser Erbat, Zana Turan û Faik Kızılay in.

NÛÇE

Makîneya şerê taybet li Zapê hate rûxandin

Şerê ku piştî bûyera Susurlukê di navbera polis û artêşê de dest pê kir, heftaya çûyî ket qonaxêke nû. Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk piştî ku Erbakan û Çiller ji ser kar dûr xist û hikûmeta nû bi Yılmaz, Ecevit û Cindoruk da avakirin, hê jî dev ji Tansu Çillerê berneda.

Niha tê eşkerekirin ku polisên li ser daxwaza Çiller û Akşenerê di nav artêşê de karê nehênî kirine. Li gorî agahiyan Akşener ji bo vî karî fermana avakirina komekê daye û di bin serokatiya Serokê Karê Saloxdayînê yê Emniyetê Bülent Orakoğlu de. Vê komê bi rîya polisên ku leşkeriya xwe dikin hinek belge dizîne û gihandine wan an jî li telefonê Serkanê Giştî guhdarî kirine. Piştî ku ew yek derketiye holê, Akşener Orakoğlu tevî malbata wî şandiyê Amerîkayê. Dubendiya di navbera artêş û polisên de dihat zanîn, lê kesî ew qas jî nakokî texmîn nedikir.

Ew nîşaneyên qeyraneke dûr û dirêj in. Artêş îcar li dijî Çiller û hevalbendên wê bi ser ketin, lê heta kengî? Wê çend serokwezîr çavên xwe ji têkçûnên artêşê bigirin? Belkî îro serokwezîr wekî Erbakan bi dizî dibêje "Artêş heyfa têkçûna xwe ya di şer de ji me distîne", lê wê rojek were hinek vê rastiye eşkere ji bibêjin. Wisa xuya dike ku wê ew şer serê gelek wezîr û serokwezîran bixwe. Her wiha wê bi vê jî nemîne, pir naçe wê

Di daxuyaniyê de tê ragihandin ku bi giştî di nava mehekê de 405 çalakiyên gerîla pêk hatine. Di van çalakiyan de 18 ji wan subay 543 leşker, 6 polis û 4 ajan hatine kuştin. Her wiha li başûr ve welêt jî 5 ji wan fermanar 450 şervanên PDK'ê bi desê gerîla hatine kuştin. Li gorî daxuyandina ARGK'ê firokeyek jî di nav de 66 hacetên şer hatine rûxandin.

dewleta tirk êrişî cîranên xwe jî bike. Ji niha ve kesên wekî Orhan Kılıçoğlu rasterast Yewnanîstanê tehdît dikin.

Lê bi tu awayî nikarin têkçûna hêzên tirk li hemberî hêzên ARGK'ê veşêrin. Daxuyaniya ARGK'ê ya li ser bilançoya meha pûşperê ve yekê baş li ber çavan radixe. Di daxuyaniyê de tê gotin ku hêzên gerîla ji niha ve sala finalê qezenc kirine. Her wiha tê diyarkirin, di 13 salên şer de gerîla tu car ew qas di şer de serkeftî nebûye û bi zayiyata herî biçûk serkeftineke wiha mezin bi dest nexistîye. Li gorî daxuyaniya makîneya şerê taybet li Zapê hatiye rûxandin.

Di daxuyaniyê de tê ragihandin ku bi giştî di nava mehekê de 405 çalakiyên gerîla pêk hatine. Di van çalakiyan de 18 ji wan subay 543 leşker, 6 polis û 4 ajan hatine kuştin. Her wiha li başûr ve welêt jî 5 ji wan fermanar 450 şervanên PDK'ê bi destê gerîla hatine kuştin. Li gorî daxuyandina ARGK'ê firokeyek jî di nav de 66 hacetên şer hatine rûxandin.

Disa tê ragihandin ku 13 PDK'yî û 40 cerdevan dîl ketine destê gerîlayan. Di vê mehê de 111 gerîla di şer de can dane, 46 gerîla jî birîndar bûne. Di he-man mehê de pîraniya wan başûrî 258 kes beşdarî nav refên gerîla bûn.

Cerd û kemînên gerîla zêde bûn

Li gorî agahiyan ku bi dest ketine, heftaya çûyî li Başûr û Bakur li gelek cihan şer derketiye û li gelek cihan jî çalakiyên cerd û êrişên gerîla li ser bingehên hêzên dewletê pêk hatine. Di encama van bûyeran de gelek xisar gihîştîye hêzên dewletê û PDK'yîyan.

Roja 25'ê pûşperê gerîla bi hêzeke mezin avêtin ser Sasonê û avahiyên hêzên dewletê bi çekên giran kutan. Li gorî çavkaniyan gerîla hinek leşker hatine kuştin, lê çavkaniyên dewletê didin zanîn ku tiştêk bi tu kesî nehatiye.

Li aliyê din roja 24'ê pûşperê hêzên dewletê ku ji operasyonê vedigeriyan li derdora Çemê Hêzil a Silopiyê ketin kemîna gerîla, di şerê ku derket de 3 leşker mirin, 5 leşker jî birîndar bûn. Li Qulpê jî gerîla êriş birin ser ev erebeyên leşkerî û du leşker hatin kuştin. Di 25'ê pûşperê de di navbera gerîla û leşkerên ku li Çiyayê Amanosê derketibûn operasyonê li dora Îslahiyya Dilûkê, şer derket, di şer de

Uzmançawîş Faruk Çam hate kuştin, leşkerek jî birîndar bû. Li gorî çavkaniyên dewletê di vî şerî de gerîlayek jî hatiye kuştin.

Şerê li Başûr jî piştî ku hêzên dewleta tirk vekişin di navbera gerîla û hêzên PDK'ê de dom dike. Gerîla êrişê dibin ser baregehê PDK'ê û ji ber ku PDK di şer de tîk diçe, dest diavêje metodên dewleta tirk, gundan vala dike, zilmê li gundiyan dike. Li derdora Qesra Seddam komek PDK'yî ketin kemîna gerîla, di şer de 2 PDK'yî hatin kuştin.

Roja 30'ê pûşperê gerîla avêtin ser çeperên cahşên gundê Silwana (Pinar-goz) yê Geverê di şerê ku derket de 3 cerdevan hatin kuştin, 4 heb jî birîndar bûn. Li Orşîna Qulpê jî di navbera hêzên gerîla û hêzên dewletê de şer derket di vî şerî de 2 leşker û cerdevanek hatin kuştin. Tê gotin ku di vî şerî de gerîlayekî can daye.

Her wiha li çoltera di navbera Midyat û Omeriyan de gerîla êriş birin ser hêzên dewletê ku derketibûn karê dewriyeyê. Di encama vê êrişê de leşkerek hate kuştin, 3 leşker jî birîndar bûn.

Li aliyê din banga ARGK'ê ya ji bo cerdevanan jî bandora xwe nîşan da. Li gorî agahiyan 37 cerdevanên gundê Çardah ê Farqînê çekên xwe danîne.

Roja 27'ê pûşperê hêzên ARGK'ê gundê Gîsê yê ku dikeve rojhilatê Çiyayê Garê dorpeç kirin. Piştê jî gerîlayan li dor mala Mele Arifê ku ji dewleta tirk re ajantî dikir girtin û jê xwestin ku ew xwe bispêre hêzên gerîla, lê Mele Arif ev yek nepejirandiye, li ser vê yekê gerîla mala wî dan ber guleyan û Mele Arif hate kuştin. Tê gotin ku gerîla dest danîne ser muhîmatê ku artêşa tirk dabû Mele Arif. Ji bilî vê li herêma di navbera Derelok û Şeladizê de roja 27'ê pûşpera 1997'an yekîneyeke PDK'ê kete kemîna gerîla, derbarê xesara ku gihîştîye wê yekîneyê tu agahî bi dest neket. Lê li Stîkûra Sidînî ku bi ser Sidekana Xakûrkê ve ye, erebeyeke PDK'ê li mayîne qelibî. Tê gotin ku erebe bi temamî rûxiyaye û tu kes jê nefiliyê.



Piştî hilibijartina dawîn dîsa Çiller bi îdiaya ku wê PKK qedandiye hate ser kar û di dawiyê de ew bi xwe û tevî çeteyên xwe qediya.

NAVENDA NÛÇEYAN

Qasimlo ne Simko bû., dîrokê çawan xwe şopand..?!

DEHAM EBDULFETTAH

Serleşkerên îranî doza hevdîtina û hevpeyvînê ji bo çareserkirina kêşeya kurdî, li Simko kirin. Simko ev doz pejirand û di 21.6.1930'î de gihîşt Covangehê (bajarê Şino). Hingê, leşkeran, bi hêsanî Simko girt û ew kuşt.

Dr. Qasimlo vê bûyera dîrokî, di pirtûka xwe (Kurdistan) de berçav dîke. Û bi şeweyekî dilêş û xemgîn, mixabîniya xwe, der barê xapandina Simko de diyar dîke. Lê heger Simko, bi soza îraniyan hate xapandin û canê xwe bi hêjayî spart wan; ma Dr. Qasimloyê zanyar, profesorê siyaseta û aboriyê li zanîngeha Pragê, bi çi hate xapandin, û çawan xwe bi destên dijminên xwe da kuştin.

Erê, rast e.. Qasimlo ne Simko bû û ne Viyêna jî Şino bû. Lê digel van qonaxên ji hev dûr û têvel jî, dîsan dîrokê, li ber siya nezaniya kurdî, şopa xwe ajotiyê.

Sala 1930'î Simko Axayê Şikakî bi sozeke xapînok canê xwe da der. Di wê salê de jî, Ebdurrehman Qasimlo, li guadekî nêzî Ormiyeyê (Rizayê) çavên xwe li ronahiya jiyane vekir. Piştî herifandina Komara Mehabadê (1947), Qasimlo ji Kurdistanê derket û li Iraqê (Bexdayê) wekî penaberekî, cîwar bû. Qasimlo ji Iraqê jî, berê xwe da Ewropayê û li Pragê (Çîk) hêwirî, û xwendina xwe (beşê zanistiyariya aborî) li zanîngeha wê kuta kir. Sala 1968'an, Qasimlo piştigiriya bizava Dubçek (Bihara Pragê) kir. Sala 1970'yî vegeriya Bexdayê, û ji nêzikayî ve tev li têkoşîna gelê xwe bû. Qasimlo wekî endamekî berpirsiyar rêberiya partiya xwe (PDK) kir û li dijî rejîma Şahê xwînmij, şerê partizanî kir. Sala 1971'ê Qasimlo vegeriya Ewropayê û li Fransayê bû penaber. Piştî serketina Xumeynî jî, Qasimlo deh salan (1979-1989) şerê xwe li dijî olpeştan berdewam kir.

Şerê Kendavê (1980-1988) rewşeke bêmirêş (bêrewnok) kişande ser kurdan. Kurdên Kurdistanê Iraqê li dijî rejîma Bexdayê bûn rêber û paşgîrên leşkerên Îranê û yên Kurdistanê Îranê li dijî Tehranê, bûn rêber û paşgîrên leşkerên Iraqê. Û bi vê helwestê, hevdijîtiya kurdan eşkere û rasteder bû.


Heger Şerê Kendavê û rewşa xerab û ketî bi ser kurd de anî, agirbesta wî şerî dê serencameke xerabtir û ketîtir bi ser wan de bîne. Sala 1988'an, ew şer rawestîya. Her dewletek ji wan (Iraq û Îran) li kurdên bindestên xwe vala bû û dema tolstandinê hat. Kurd, ji her du

aliyan jî, gelekî êşîyan. Lê, ji aliyê Iraqê, êşa wan zortir û girantir bû.

Payiza 1988'an, Celal Talabanî (Serokê YNK'ê) hevdîtina bi hindêk berpirsiyarên rijema Îranê re ji bo çareserkirina kêşaya kurdî kirin. Daxwaza Talabanî ew bû ku nûnerên îranî û yên kurdî, bi alîkariya YNK'ê li hev rûnin, û hevpeyvînan bi hev re daxin rojevê.

Rastî, dostaniya Talabanî ya xurt, bi rejîma Îranê re, ji hêlekê û bi Qasimlo re, ji hêlekê dî, kir ku hewldanên wî, di encam de, ber bigirin. Her du layan jî, (kurdî û îranî) pêşniyaza Celal Talabanî pejirandin. (1)

Hevdîtina pêşin di navbera nûnerên kurd û îraniyan de, di dawiya meha 12'an a sala 1988'an de li Viyanayê paytexta



DR. EVDIREHMAN QASIMLO

Awistiryayê (Nemsa) pêk hat. Hevdîtina duwemîn jî, di destpêka sala 1989'an de pêk hat. Nûnerên kurdan, di her du civînan de bi serokatîya Dr. Qasimlo û endamtiya nûnerê (PDK-I) li Ewropayê, Ebdullah Qadirî Azar bûn û yên îraniyan bi serokatîya Mehmed Cafer Sehrewerdî, ku bi navê Rehmî dihat nasîn û endamtiya Hacı Mistefawî bûn

Sehrewerdî, berpirsiyarekî parastinê hêza pasdar, li herêma Kurdistanê bû. Û Mistefawî jî, karmendekî mezin, di şalyariya ragiyandina Îranê de bû.

Her du civîn jî, bi alîkarî û rêberiya Celal Talabanî pêk hatin. Bijartin û nîşankirina cih û çaxên civînan, di destê Talabanî de bûn. Parastin û zêrevaniya nûneran jî, berpirsiyariya YNK'ê bûn.

Ji bilî Celal Talabanî tu kesî nizanîbû hevdîtina nûneran kengî û li ku dibe.

Karmendek ji balyozxaneyê îranî, bi navê Emîr Mensûr Bazirgan, xwarina nûneran amade dîkir. Lê Bazirgan, nikaribû bi tena xwe derbasî civînê bûbûya. Her carê endamekî YNK'ê, bi wî re derbas dibû. Bi vî şeweyî, ew her du civînan rasteder, di navbera kurd û îraniyan de, nepend û ve-

sartî bûn. Û Talabanî bi xwe, berpirsiyarê wê nependiyê bû. Piştî du-sê mehan bêhna wan her du civînan derket û tiştên ji wan, li ser zimanan geriyan. Berpirsiyarên îranî ji

van di govara Al-Hîwar a erebî de, Serokê Cezayir ê pêşin Ehmed Bin-Bêlla bo navberiya wan berbîjar kir. Di destpêkê de îraniyan Bîn-Billa pejirand, wekî ku kurdan jî ew pejirand. Berî rûniştinê bi demeke kurt, îraniyan ragihandin ku ew naxwazin Ehmed Bin-Bêlla di civînan de amade bibe. Hingê, Fadil Resûl, ji neçarî, navberiya her du aliyan pejirand.

Roja 12'yê meha gelawêjê (Temuz-Yolga) Sehrewerdî û cigirê wî Mistefawî, bi du paseportên diplomatîk li bala-firgeha Viyanayê peya bûn. Di wê rojê de jî, Dr. Qasimlo hêvalekî xwe yî pir nêz, bi navê Azad, dît û soza hevdîtineke girîng di demjimêr 17 û 15 xulke (daqîqe) roja 13'ê gelawêjê de li xewxaneyê (otêla) Hilton pê re danî û di wê rojê de jî, Fadil Resûl serdana dostekî

xwe kir û kilîta xaniyê wî jê stand. Balyozxaneyê îranî jî, wê rojê bizaveke nerehatî (nenormal) di nav karmendên xwe de dipelard.

Demjimêr heft û panzdeh xulke, Azad li xewxaneyê Hilton, bendewarê Qasimlo bû. Demjimêr heft û nîv, Azad zivêr bû, ket gumanan: Qasimlo nehat soza xwe..?

Demjimêr nêzî heştan, zengilê telefona polis deng da: He-lo.. Merovekî birîndar, li ber dergehê û xwîn bi piranî jê dihere..!

Bi gihîştina polisê, mirovekî dî, bi serê birîndar de xwar dibû û pêçekek kaxez jî destê wî derdixist. Polis ew mirov Emîr Mensûr Bazirgan girt û yê birîndar Mehmed Cafer Sehrewerdî jî şand nexweşxaneyê.

Polis bi avahiyê ve hilkişîya heta qatê pîncan. Deriyê hêwanê (salonê) heta ser piştê vekirî bû. Deriyê hoda mîyanan jî, vekirî bû. Termê sekretêrê PDK-I dît. Qasimlo dirêjkirî bû û li rex wî, du termên dîtir ramêdandibûn: Yek ji wan nûnerê PDK-I li Ewropayê, Ebdullah Qadirî Azad bû û yê dî jî, rojnamevan û profesorê Zanîngeha Viyanayê Kurê Silêmaniyê, Fadil Resûl bû. Serên her sê mirovan jî, bûbûn nîşana gulebarandina kujeran. Ji deriyên vekirî (bêyîşikandin) û ji pergala cil û kursiyar, tanwanbar ji aliyê kuştîyan ve naskirî bûn.

Hevdîtina Xwînî (13.7.1989)

Fadil Resûl, rewşenbirekî zanyar, rojnamevanekî zîrek û akademîsyenekî li gorî daxwaza dostê xwe, Qasimlo ye. Fadil, li gorî daxwaza dostê xwe, Qasimlo, di navbera kurd û îraniyan de, çû û hat. Di dawiyê de her du aliyan jî, navberiya Fadil Resûl pejirand, bi mercê ku ew tenê li civînê amade bibe, bêyî ku tu kes, tiştêkî li ser civînan zanibe. Fadil Resûl, xwe li gorî vî kar û barê giran nedît û hevkarê xwe yî rojname-

Girov û nîşandekên bûyerê

1- Piştî polîsan "bazirgan" li ber 'sehrewerdiyê' bîrandar girt, li wî geriyên 9.000 dolarên amerîkî û hindêk belge name pê re girtin. Di vekolînê de, Bazirgan bersiva xwe wisan da: Haya min ji çi tiştî nîn e. Ez derketim ji bo xwarinê ji nûneran re bînim. Ez nizanim çi bû, çawan çêbû...!

Piştî 24 demjimêran, Emîr Bazirgan, hate berdan û bêyî derengî ji balyozxaneyê berê xwe da balafirgeha Viyanayê û çû Îranê...!

2- Birînê Sehrewerdi di dest û çengoga wî de bûn. Bi lez, birînteroşeke kiryanî jê re çêkirin. Piştî Sehrewerdi bi hişê xwe ve hat, bersiva polîsan bi vî şeweyî da: Em rûniştibûn, derî vebû û mirovek... yan du mirov derbas bûn û berik li me reşandin... Polîsan ragihandin ku Sehrewerdi ji ber birînê xwe, nema karibû bi peyiviya. Polîsan, vekolîna xwe bi Sehrewerdi re eşkere nekir. Ew tiştê hat gotin jî, bi şeweyekî nefermî belav bû. Di roja 22'yê gelawêjê de Sehrewerdi ji nexweşxaneyê derket û çû Balyozxaneya Îranê, paşê berê xwe da balafirgeha Viyanayê û ji wir firiya Tehranê.

3- Piştî rûberiya 13'ê gelawêjê bi çend demjimêran, polîsan çend tişt, di hermîla gemarê de dîtin. Têkiliya wan tiştan bi bûyerê re hebû. Ew tişt jî, ev bûn:

- a- Kurtikekî werzişê (Sporê) tev bi xwîn bû.
- b- Tivîngekê ûzî, nîv otomotîk
- c- Du debançeyên (şesarên) bi deng-kuj.
- ç- Belgenamêyek, firotina motorekî Sîzûkî diçespîne. Paşê hate nasîn ku yê ew motor kiribû, Sehrewerdi bi xwe bû. Hingê, hate gotin: Reng e, (diyare) ew motor bo wê xwînrijaftinê hatibe kirin; reng e jî, ku Hacı Mistefawî, bi wê moto-

rê, ji cihê bûyerê reviyabe.

4- Roja 13'ê gelawêjê, Hacı Mistefawî wî wînda bû, tu kesî cihê wî nas nekir. Paşê hat nasîn ku Mistefawî ji Balafirgeha Viyanayê çûye Tehranê.

5 - Roja 28'ê gelawêjê pêşanderên kurd, li Balafirgeha Viyanayê dicivyan û revandina mirovekî bi navê 'Magabî' yan jî bi navê 'Kuzafêr' ku çûbû Îranê, dixist stûyê berpirsiyarên balafirgehê û polîsan.

6 - Çi raporên fermî, di lêgerîn û vekolîna vê bûyera xwînî de, ji aliyê polîsan ve nehatin ragihandin û tiştêk ji hêla wan, belav nebû.

7- Tu kes, ji hêla lêvekolan berguman nebû, û tu kes jî, pêşkêşî dadgehan nebû.

Lê, mixabin diyar e ku ew tîkiliya di navbera dîrok û bîreweriyê de, di mêjiyê kurdan de, ne pir meyaye. Gelo li dirêjahiya dîrokê, çend serwer û serkêşên kurdan xapiyane?! Çendê caran malên xwe û malên gelê xwe bi destên xwe, wêran kirine?! Û çendê caran jî, bi erzanî, serên xwe derbasî givikên sêpiyan kirine?!

8- Piştî demekê, rojnamevanekî îngilîzî, li Tehranê ev pirs ji Refsançanî kir: Gelo kujerên Qasimlo, nehatin naskirin? Refsançanî got: Em li bendî encama lêvekolên dewletê ne. Dema lêkolînên wan kuta bibin, em ê her tiştî eşkere bikin! Û heta niha, hîç tişt eşkere nebûye.

Kujerên Qasimlo kî bûn?!

Polîsên Awistiryayê, tu kes, bi bergumanîya kuştina Qasimlo û hevalên wî, pêşkêşî dadgehê nekir. Piştî demekê, girtinamêyek ji çar bergumanên Îranî (Sehrewerdi, Mistefawî, Bazirgan û Magabî) hate belavkirin. Lê piştî çi?! Piştî ku her çar jî, li ber çavên polîsan, ji Balafirgeha Viyanayê derketin Îranê...!!

Kurd, bêdudilî, kuştina Qasimlo û he-

valên wî dixin stûyê rejîma Îranê û dibêjin hemû tevger û rûdanên berî bûyerê û yê nîşandekên kuştina Qasimlo planeke Îranî ya gemarî bû.

Îranî dibêjin, reng e ku kurdên hevrikî Qasimlo, ji partiya wî ew kuştibin. Reng e jî, ku peyên rejîma Bexdayê, yan partiya Xelq a Îranî ew kuştibin. Çimkî ev her sê alî jî, naxwazin kurd û Îranî, li hev bînin.

Lê, zêrevan û şopajoyên vê tawankariyê tev, berpirsiyarên rejîma Tehranê berguman dikin. Ev bawerî jî, li gorî van girov û nîşandekên ava kirine:

1- Berpirsiyarên Îranî, alîkarî û navberiya Celal Talabanî, di civîna gelawêja xwînî de, nepejirandin, ji ber ku parastin

û zêrevaniya civînan berpirsiyariya Talabanî bû. Û vê yekê jî, keys û derfeta kuştina nûnerên kurd nedida Îraniyan.

2- Berî gelawêja 1989'an, bi demeke kurt, Îraniyan navberiya serokê Cezayirê yê pêşîn, Ehmed Bin-Bêlla nepejirand û jî dêvla wî ve, Fadil Resûl ê kurd, pêşniyar kir. Vê guherînê derfeteke girîng da Îraniyan ku planê xwe bibin serî. Çimkî, Bin-Bêlla mirovekî navneteweyî yî navdar bû. Kuştina wî jî, dê bibûya aloziyeye dengdar li ser asta ragihandina navnetewî. Lê kuştina Fadil Resûl, kuştina kurdêkî bêpaşgir e.

3- Dema ku piştî Qasimlo, Sekreterê PDK-Î Dr. Şerefkendi jî, li xwaringehê, (li Berlînê 1992'yan) hate kuştin, dîsan Îraniyan xwe ji wê tawankariyê şûstin û xwîna Şerefkendi û hevalên wî xis-

tin stûyê kurdên rikeber û iraqiyan. Di dûmahika sala 1996'an de, dadgeha Almanî tilikên bergumanîyê berû berpirsiyarên rêcîma Îranî.. û bi taybetî, berû Refsançanî ve, birin.

4- Bi şeweyekî nefermî, hat ragihandin ku polîsên Awistiryayê berpirsiyarên Îranî, bi kuştina Qasimlo, berguman kirin, lê Îraniyan gef û hereşe dan Balyozxaneya Awistiryayê û berjewendiyên wan, li Rojhilata Naverast hereşe (tehdît) kirin. Ji ber van egeran jî, hemû belge û encamên vekolînên bûyerê li Awistiryayê veşartî man. Lê ji bo ku gilî û gazind li wan nebin, piştî reva tawanbarên Îranî, polîsan girtîname ji bo wan belav kirin.

5- Ji bilî her şeş nûnerên kurdî û Îranî û balyozxaneya Îranê, tu kesî çax û cihê civînê nizanibû. Ji ber van egeran em bawer dikin, ku yê Qasimlo û her du hevalên wî, bi wê plana dirinde kuştin, berpirsiyarên Îranî bûn.., ne tu kesên dîtir bûn..!

Tê gotin ku Dîroka gelê hiş û mejiyê geş e. Rastiya vê gotinê, ne tenê ji serhatiyên dîrokî dixuye, ji hêla morfolojiya zimên ve jî wisa ye, lewre di nêzîkiya peyva 'meji' û peyva 'mejû' yê (dîrokê) de jî berçav dibe.

Lê, mixabin diyar e ku ew tîkiliya di navbera dîrok û bîreweriyê de, di mêjiyê kurdan de, ne pir meyaye. Gelo li dirêjahiya dîrokê, çend serwer û serkêşên kurdan xapiyane?! Çendê caran malên xwe û malên gelê xwe bi destên xwe, wêran kirine?! Û çendê caran jî, bi erzanî, serên xwe derbasî givikên sêpiyan kirine?!

Rast e, Simko bîrewerî xwe da kuştin. Qasimlo jî, sala jidayikbûna xwe ji bîr kir û li ser şopa Simko çavên xwe li ser golên xwînê girt.

Erê.. Lê Qasimlo ne Simko bû.. û ne Vîyêna jî Şîno bû; dîrokê çawan xwe şopand?!?

Divê em bar li xwe giran nekin

OSMAN ÖZÇELİK



Evdilmitelib Teyyib xortekî binxetî bû. Ango ji Başûrê Biçûk bû. Tîn û şewqa şerê gerîla dabû wî û xwîn di damarên canê wî de dikeliya. Ji xwe re sazêk bi dest xistibû, di govend û dîlanên herêmê de kilam û dûrik digotin. Dîlan û govend ji wî re bûbûn cihên xwepêşandanê ku pesnê gerîla û şerê wan bide.

Rojekê telefonî hevalekî xwe dike. Diya hevalê wî tê ser telefonê.

- Elo... Tu kî yî?

- Ez.. Evdilmitelib Teyyib im xaltîkê..

- Kurê min wele min tu nas nekirî.. Te got tu kî ye?

- Evdilmitelib difikire ku hevalê wî navê wî yê fermî (yê nasnameyî) nas nake. Belê, dibe ku navê wî yê hunermendî nas bike. Dibêje;

- Dayê ez 'Hevalê hozanê şoreşgerê bargiran im.'

- Evdilmitelib ev navê dîv û dirêj li xwe kiribû. Di dîlanên de ew, bi vî navî didan naskirin.

- Dayê piçekî radiweste û paşê zû bi zû dibêje

- Mala minê! Kurê min de barê xwe deyne

û paşê telefon bike!..

Evdilmitelib telefonê di cih de digire..

Em kurd bar li xwe giran dikin. Wekî ku barê me ne tîra me be, em barekî din li ser milê xwe dikin. Em nikarin di bin barê xwe de li ser lîngan bisekinin, em radibin barê jî hêza xwe mezintir didin ser milê xwe dikin. Paşê em di bin bîrê de dimerixin û em li erdê dirêj dibin.

Ristemê Zal û Selahîdînê Eyyûbî barê îslamê dan ser piştê kurdan. Ewrûpiyan hemî hêzên xwe kirin yek û êrîş birin ser ereban. Kurdan sînga xwe dan ber derbên şûran û ewrûpî bi şûn de vegeyriyan. Îslam xelas bû, ereb bûn biserketî. Belê kurd şkestin, qir bûn.

Şahê Îranê û padîşahê osmanî dijminatîya hev û din dikirin. Doza ax û erd, bac û xûgiyê li hev û dû dikirin, hinek kurdên alewî li ser navê alewîtiyê piştgiriya şah dikirin. Yavuz Sultan Selimê osmanî bi sedhezaran kurdên alewî serjêkirin. Paşê osamanî û Îraniyan welatê kurdan li hev û din par kirin.

Gava Îngilîz ketin Stenbolê û Yewnan ketin Îzmîrê, Mustafa Kemal xwe gihand kurdan. Li Sêwazê û li Erzûrûmê serokeşîrên kurdan peymanî piştgiriya M. Kemal mor kirin. Di van rojan de keç û bûkên tirkên, ji paş perdeyên şibakên zikakan kulîlk û ramûsan dişandin ji serbazên yewnanî û Îngilîzan re.

Kurdan wê rojê ji tirkên re negotin "Cehenema we kiriye, em ne bi we re ne!.." (Neteweyên din hemûyan wisa gotibûn û gihîştibûn azadiya xwe) Kurd li ser navê biratiyê, li ser navê hemwelatiyê û hemolîyê

ketin şer. Bi deh hezaran kurd hatin kuştin. Tirk xelas bûn. Xelata me bû çi? Qedexkirina ziman, înkara hebûna me û tevkuştin û sirgûnî..

Mala Xwedê ava be ku em zû ji kêmaqiliyê din vegeriyên. Me dikirî xwe bida bin barê proleterîya cihanê. Me yê hemû sazûmanên burjûvazî û împeryalîstan hilweşandana, proleterên hemû cihanê bikirana yek û ew xelas bikirana. Xwedê mala bavê me stîrand ku proleterên cihanê bi xwe bi hawara me de hatin û gotin: "Em jî halê xwe xweş in. Dev jî me biqerin." Proleter li dijî me bi burjûvazî re bûn yek ku em wan xelas nekin. De baş e. Xwedê qenciyeke bi me, hezarî bi wan bike. Îro kurd ne wekî berê ne. Cara yekemîn e ku kurd tenê ji bo xwe, ji bo ax û mafên xwe dilebitin. Îro kurd dizanin ji bo kê û ji bo çi di nav tîkoşînê de ne. Ji bo vê ye ku em hin bi hin û piço bi piço digihêjin jiyaneke bi rûmet.

Neyarê nediyar di kozîkê de ye. Holan û tofan didin me. Dibêjin wê kurd Rojhilata Navîn xelas bikin û paşê jî hemû cihanê..

Na..Na!.. Bes e serî li me mezin bikin. Em ji tu gellî ne gemas tir û jirtir in. Xelaskirina cihanê jî bi me nemaye.

Em tenê dixwazin mîna herkesî bin, ne piçekî zêde û ne piçekî kêr.

Divê daxwazên me jî, mîna jiyana-me ya di bin konekî reş ên koçeran ku li zozanên hênîk hatiye vegirtin, sade be.

Şîreta diya hevalê Evdilmitelib di guhên me de ye. Em bar li xwe giran nekin.

Wê rojê dewlet li Sêwazê bû

Bêguman, Tevkujiya Sêwazê di dîroka cihanê de di nav tevkujiyên herî hov û dirinde de cih digire. Wekî tê zanîn di 2'yê tîrmeha 1993'an de li Sêwazê 37 kes bi şeweyekî nedîtî hatin qetilkirin. Lê, cihê xemgîniyê ew e ku li ser sedemên tevkujiyê nîrxandinên tekûz nehatin kirin. A balkêş, tîkiliya xurtbûna tevgera azadî û bûyerê nehatê danîn. Piştî tevkujiya Sêwazê rêxistinên alewîyan bi piranî di nav eniya laîkperestan de cih girtin û piştigirîya kemalîzmê kirin. Lê sedema bîngêhîn dewleta tirk li dijî tevgera Kurdistanê û îslamê bi zanayî rewşa alewîyan derxist pêş. Di vê xalê de, burjûvaziyê alewîyan ku hêdî hêdî bi pêş diket, aligirîya dewletê kir. Bi vê yekê alewîyên ku bi salan li dijî serdestan li cem bindestan cih digirtin, hêdî hêdî ji nasnameya xwe ya dijber dûr ketin.

Li ser vê mijarê Endamê PKDW'ê û Serokê Yekîtiya Alewîyên Kurdistanê Ali Haydar Celasun agahiyên balkêş dan rojnameya me, Celasun bal kişand ser rewşa berî bûyerê û da zanîn ku berî tevkujiyê li Enqereyê wî Rêveberê Komela Pir Sultan Abdal ê wê demê Ali Balkîz hişyar kiriye û gotiye ku mirovên diçin Sêwazê li otelê ranezînin û li Taxa Ali Baba li malan bikin mêvan."

Endamê PKDW'ê Celasun li ser helwesta Aziz Nesin jî ev nîrxandina balkêş kir: "Dîsa min ji wan re got, tîkiliya wî zilamî bi alewîtiyê nîn e. Di demeke wisa de ji bo weşandina pirtûka Selman Ruşdî tu sedem tune ye, lê ew dixwaze vê pirtûkê biweşîne. Lewre ev zilam dê li Sêwazê provakasyonê pêk bîne, bi xwe re nebin Sêwazê. Dîsa me got baweriyê xwe jî bi Erdal neynin. Lê kesî guh neda me, gotin me ji Erdal garantî standiye."

Celasun Tevkujiya Sêwazê wekî berdewama Tevkujiya Qoçgirî û Dersimê bi nav kir û got ku serok û rêveberên rêxistinên heyî yên alewîyan pêşengiya alewîtiyêke pûç û qirêjê dikin. Celasun wiha berdewam kir: "Lê, em-bi xêra PKK'ê jî vê rewşê filitîn. Em di nav serokatiya PKK'ê de hînî biratiya gel û mezheban bûn. Em niha li ser rîya Şêx Bedreddîn, Pîr Sultan û Baba İshak dimeşin. Polîtîkayên dewletê tîk çûn."

Bektaşî û Kizilbaş ji hev cuda ne

Li ser heman mijarê nêzik bike Gerîndeyê Giştî yê Kovara Zülfiyar ku niha nayê weşandin Hüseyin Karataş, bal kişand ser cudabûna alewîyên Kizilbaş û diyar kir ku digel ku bektaşîyan her dem li cem dewletê cih girtine, alewîyên Kurdistanê Kizilbaş li dijî serdestan derketine. Karataş got ku, dewlet di rastiya xwe de li dijî vê alewîtiyê derdikeve. Dîsa Gerîndeyê Zülfiyar bi bîr xist ku dewletê berî tevgera kurd alewî li dijî tîkoşîna çinayeti bikar anîne û niha jî li dijî tevgera kurd bikar tîne.

Karataş girêdayî van gotinan wiha got: "Piştî ku kêşeya kurd hat rojewa ci-

Dewletê li dijî kesên tawanbar jî helwest negirt. Divê mirov ji bîr neke ku Tansu Çillerê piştî bûyerê wiha gotibû: "Şikir ji Xwedê re tiştêk bi kesên ku li ber otelê bûn nehat. Ev şewateke ji rêzê ye. Her wiha Erdal İnönü, ji ber ku li Kibrisê daristan şewitîn çû wê derê, lê neçû Sêwazê.

vakê, hin derûdorên qala "ronesansa alewîyan" kir. Bi dîtina min tiştêkî wiha li rastê tune ye. Berevajî vê yekê ev "kuştina ruhê alewîtiyê" ye. Tîkoşîna alewîyan li derva dan destpêkirin. Dewletê ji bo ku tîkoşîna kurdan bindestên din jî hişyar neke polîtîkayên bi vî rengî meşandin. Dewlet nasnameya hinekan dinase, ya hinekan jî diperçiqîne."

Hüseyin

ALI HAYDAR CELASUN

Karataş, bi

tiştêkî bal kişand ser rola dewletê û bi bîr xist ku di dema Tevkujiya Mereşê de jî, roja bûyerê hemû hêzên dewletê jî cihê bûyerê hatine vekişandin. Karataş jî bo Tevkujiya Sêwazê jî da zanîn ku hin der û dorên alewî dibêjin "Dewlet li ku ye" Ev xwe xapandin e. Dewlet jixwe li wê derê bû. Karataş axaftina xwe wiha domand: "Her wiha dewletê li dijî kesên tawanbar jî helwest negirt. Divê mirov ji bîr neke ku Tansu Çillerê piştî bûyerê wiha gotibû: "Şikir ji Xwedê tiştêk bi kesên ku li ber otelê bûn nehat. Ev şewateke ji rêzê ye. Her wiha Erdal İnönü, ji ber ku li Kibrisê daristan şewitîn çû wê derê, lê neçû Sêwazê."

Durûtiya CHP û DSP'ê

Me li ser vê mijarê bîr û baweriyên Nivîskar û Lêkolîner Etem Xemgîn jî pirsîn. Xemgîn bi taybetî bal kişand ser bîrêxistinbûna alewîyan û da zanîn ku

tevkujiyên alewîyan ji ber vê yekê pêk tên. Xemgîn got ku lê dewlet li hember alewîyan bi şeweyekî taybet tevdiqere. Her wiha Xemgîn li ser durûtiya partiyên wekî CHP û DSP jî rawestiya û wiha got: "Ya balkêş ew e ku ev tevkujiyê di dema desthilatdariya partiyên herî laîkperest de hate lidarxistin." Nivîskar Etem Xemgîn gotina xwe bi vî rengî domand: "Dewlet û hin rêxistinên alewîyan dixwazin alewîtiyê bikin malê tirkan. Tirsê dewletê ya herî mezin tîkoşîna alewîyên kurd a neteweyî ye. Ji bo ku



yê di gel vê tevkujiyê tola hemû tevkujiyan hildidin."

Ji aliyekî din ve her çiqas alewîyên kurd bi salan ji ber bandora kemalîzmê û çepgirên tirk ji kurdîtiya xwe reviyane jî û jê şerm kirine jî Têvgera Azadiyê wekî gelek waran di vî warî de jî pêşketinên gelekî hêja û bîngêhîn pêk anîne. Êdî kurdên alewî bi serbilindî xwe wekî 'kurdekî alewî' bi nav dikin.

Di van salên dawîn de li deverên ku berê çepgirên tirk serdest bûn niha bi piranî tevgera azadî bi pêş ketiye û bûye desthilatdar. Der bare vê yekê de gotinên endamê PKDW'ê Ali Haydar Celasun rewşa dawîn baş didin xuyakirin. Celasun bal kişand ser, "ji holêrabûna nakîyên mezhebî yên Kurdistanê" û da zanîn ku êdî alewî nabêjin "em alewî ne" û wiha berdewam kir: "Bi tevgera azadiyê kurd û tirk hînî tirkîti û kurdîtiya xwe bûn. Têvgera kurd mirov ji nû ve afirand. Şaffî, alewî, sunî û ateîst ji nû ve afirandin. Ev guhartinên dîrokî û gelekî hêja ne" Ali Haydar Celasun di dawîya axaftina xwe de li ser alewîyên tirk jî got ku, alewîyên tirk heya îro kengî jî bo şerê qirêjî devê xwe vekirine. Celasun gotinên xwe wiha girêdan: "Digel karên qirêjî yên dewletê bila kes xeman nexwe, serokati û parlamentoya me tiştên gelekî hêja dike, sala finalê qediya. Niha dora tiştên din e..."

Li ser bandora tevgera azadî a li ser alewîyên kurd jî Hüseyin Karataş jî me re axivî. Karataş bal kişand ser girîngiya neteweyîbûnê û diyar kir ku, tevgera azadiyê rewşa Tirkîyeyê jî binî ve guhartiye. Vê yekê bi awayekî asayî, bandor li kurdên alewî jî kiriye. Karataş wiha berdewam kir: "Piştî xurtbûna tevgera azadiyê hem kurdên alewî û hem jî yên din xwe ji nîrxên Dema Navîn (Ortaçağ) rizgar kirin û ber bi neteweyîbûnê ve diçin. Her wiha tevgera azadiyê her tişt zeltir kir. Kî çi ye, kî ne çi ye derket holê."

Her çiqas dewleta tirk pêşiya alewîyan vedike jî, heman tişt jî bo kurdên alewî ne rast e. Ji ber ku gava ku li Sêwazê, Dersimê gundên kurdên alewî tîk şewitandin, ev yek jî aliyê medyaya tirk ve bi tenê wekî gundên alewîyan tîk ragihandin. Her wiha di rojnameyên wekî YeniYüzyıl de alewî wekî tirkên rastîn hatin binavkirin. Hüseyin Karataş der barê vê yekê de diyar kir ku, dewlet bi şeweyekî cuda nêzîkî kurdên alewî dibe û got ku gelo çima li Tokat û Çorumê gund nayên şewitandin û mirov ji aliyê kontgerîlayan ve nayên kuştin.

Wî diyar kir ku, dewletê herêmên Sêwaz û Dersimê wekî 'herêma sor' îlan kiriye. Karataş wiha peyivî: "Divê rêxistinên alewîyan ji xwe bipirsîn: Vê dewletê heya îro çi mafên bîngêhîn yên alewîyan dane ku alewî xwe wekî temîna kemalîzmê nîşan didin. Çareserîya pisgirêkên alewîyan girêdayî pisgirêkên kurdan, çîna karkeran û bindestên dinê ye"

MAZLUM DOĞAN



● 06.07.1996

Nivîskar Azîz Nesîn çû ser dilovaniya xwe.

● 07.07.0991

Serokê Partiya Keda Gel (HEP) ya Amedê Vedat Aydîrî ku ji hêla polisên sivil ve, ji malê rîvê şevê hatibû binçavkirin, çend roj bi şûn ve li navçeya Madenê cendekê wî hate dîtin.

● 08.07.1964

Li Batmanê karkerên petrolê (TPAO) dest bi grevê kirin.

● 09.07.1904

Nivîskarê Rusî Anton Çexov çû ser dilovaniya xwe.

● 10.07.1991

Li Amedê 150 hezar kes beşdarî merasîma cenazeyê Vedat Aydîrî bûn. Hêzên dewletê kesên ku beşdarî cenaze bûne gulebaran kirin. Di encamê de 11 kes hatin qetilkirin bi sedan kes jî birîndar bûn.

● 11.07.1991


Rewşebîrê kurd Remzî li hate qetilkirin.

● 12.07.1993

Hunermend û şoreşgerê mezin Ali Temel di nav şerê azadiyê de şehîd ket.

AWIR

Li Tekirdağê şeva piştgiyariya HADEP'ê



MEHMET SATAN

Rojê 26.06.1997'an li HADEP'a bajarê Tekirdağê şeveke bi xwarin hate lidarxistin. Nêzîkî du hezar kes ji bo xwarina şevê li hev civiyan. Armanca vê şevê piştgiyariya gel a ji HADEP'ê re bû. Digel stranbêj, komên mûzîkê û rayedarên HADEP'ê beşdarî şevê bûn. Li Tekirdağê bi piranî tirk dijîn, lê hate dîtin ku gelek kurd li wî bajarî hene. Divê bê gotin ku di şevê de gelek tirk jî hebûn. Girseyeke zêdetirî hejmara ku dihat hêvîkirin, li wir gihîştibû hev. Serokê HADEP'a Tekirdağê Hüseyin Yılmaz jî got ku, min bawer nedikir ku îşev wê ev qas mirov li vir bicivin. Belê çiqas ku kurd jî têkoşînê hes dikin, ew qasî jî ji şev û şahiya hez dikin. Di şeva HADEP'ê ya li Takirdağê de reqs û govend ji ber nebûna îmkanan hate qedexekirin.

Di şevê de ji NÇM'ê Koma Agirê jiyay, Hozan Hogir û stranbêjekî ku xebatên xwe di nav HADEP'ê de didomîne bi stranên xwe yê bi tirkî rengêkî din dan şevê.

Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Mehmet Satan û Endamê PM yê Nihaf Buldan jî beşdarî şevê bûn. Di şevê de Serokê HADEP'a Tekirdağê Hüseyin Yılmaz axaftinek li ser rewşa Tirkîyeyê, bandora wan qirêjîyan li ser siyaseta Tirkîyeyê û têkiliya qirêjîyan bi kêşeya kurdî kir. Yılmaz bal kişand ser berpirsiyariya Kurdên li metropolan jî.

Piştî axaftina Hüseyin Yılmaz, Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Mehmet Satan jî li ser hilbijartina giştî û li ser politîkaya HADEP'ê ya giştî sekinî û wiha

axivî: "Divê em îro ji bo hilbijartina giştî amade bin. Divê em bi berpirsiyariya xwe bizanibin. Li vî welaî bê cudatî, çî kurd, çî tirk û çî ereb û çî çerkez, ji bo vî gelî, ji bo demokrasîyariyê, ji bo azadiyê, ji bo mafên mirovan her kesê ku bibêje ez însan im berpirsiyariyê mezin dikeve ser milê wî." Satan di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Tu kes nikare bibêje ez ne endam û rêveberê vî partiyê me, divê em kar û barên xwe yê rojane deynin aliyekî, hilbijartina giştî nêzîk e, ji bo demokrasîyê, ji bo azadiyê divê her kes xwe bide qeydkirin."

Her wiha Mehmet Satan da zanîn ku divê, ew têkoşîna mirovahiyê dikin, ji bo vî yekê wan pir bedel dane û HADEP jî bo bicîhkirina biratiya gelan, ji bo ku li vî welaî mirov bikaribin xwe bi awayekî azad îfade bikin têkoşîn daye. Dîsa Satan diyar kir ku HADEP'ê ji bo têkoşîna gelê tirk a "Kar, Ked û Nan" jî bedel dane. Pişt re jî Satan got: "Bila her kes zanibe ku bedelê ku me dane, em dîsa amade ne ku ew qas bedelên din jî bidin."


Satan di dawiya axaftina xwe de, wiha got: "Em bi pasaportê nehatine vî welaî, her wiha em dibêjin kesê ku bi pasaportê jî hatibe, cihê wî li ser serê me heye, ji biratiyê re deriyê me heta ser piştê vekirî ye" got.

Satan gotina xwe wiha qedand: "Bêyî HADEP'ê demokrasî û azadî nabe, bêyî HADEP'ê mafê mirovan nayê naskirin."

AZAD ALTUN

ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



Dengvedana şerê Başûr

Wiha xuyaye, şerê ku li Başûr de siyasîmedar û rewşebîrên kurd hê demêke dirêj mijûl bike. Li ser şer û netîceyên wê de hê pir bê nivîsandin. Ev şer xwediyê şopên mezin, kûr û newinda ye. Ji niha ve gelek tişt ser-obinî hev kirin. Text û taca malbata Barzanî xiste bin şikê û bi berçavbûneke diyar otorîte û yekîtiyê neteweyî bersefeq dibe. Perçeyên Bakur û Başûr dibin yek, baştir li hev dibanin û di nav wan de koordînasyoneke bikêrtir tê pê.


Şerê vî carê katelîzator e, giş nîrx û hêjayiyên siyasî, kulturî û exlaqî, bêjîng û sedar dike; rast û nerast, kevnar û hemdem, pûç û saxlem xayin û berxwedêr, navçeyî û neteweyî ji hev derdixe. Ji vî awirê ve tarîxî ye. Ne şerê birakujî, belê şerê nav meylên neteweyî û bavikperest, meylên merkeziyêtxwaz û navçeparêz e. Li her welaî pîrsa neteweyî heye, netewe nebûye xwediyê otorîte û navendeke welatgîr, terkîb û sosyolojiya emirmende bandêr e, tradîsyonelî û parçeparçeyî digel e, şerên bi vî awayî diqewimin. Îro kurd wate û cihêhiya vî şerî baştir hest dikin û dibînin ku ev şer ne mîna şerê nav YNK û PDK'ê ye. Sala 1992'yan dema cardî mîna îro nû û kevn ketibûn pêxêra hev, Ji vir li derveyî welaî kes hebûn ku digotin "Çi îşê Partiya Karkeran li Başûr heye, bîla vegerin parçeyê xwe" pêde dibûn. Ev niha rabûye. Êdî bervajî vî yekê her kes dibêje: "Partiya Karker ne mîvan e, şervan û têkoşerên welaî me ne. Welaî, welaî e; çî Başûr, çî Bakur ferq nake."

Bi xêra şerê vî carê, rêz û sef diyartir in. Helwest û alîgirî vekirîtir e. Dengên li dijî xayintiyê bilindtir derdikevin û êdî xayintî bi navê xwe tê navandin. Bi gotinên hevaleke gerîla ku xayintiyê baş nas dike: "PDK, yanî xayintî. Xayintî demxayêke. xerab û fekeye qirêjî û kirêt e. Xayintî di destên PDK'ê de bûye jehr û zilindar. Jehreke sistematîk ku dikeve damarên kurdan."

Mesela xayintiyê û hevkarîya bi dijminan re çu carî mîna îro bi germî û gurî ew çendî di serê listeya munaqesê de cih negirtiye û ew çendî nehatiye riswakirin. Êdî ev pîrs ji nav mirovên nivîskar û siyasîmedar derdikeve, dadikeve nav gel, dibe malê milyonan. Ev jî guhartinek e. Nîşana hişyariyê fireh û angajebûneke xwedîbingeh e.

Ji roja ku PDK bi dagirkerên tirk re êrîş bire ser şervanên kurd û înzaya xwe avêt binê qirkirina Hewlêrê û vir de hefteyê çend caran di Televîzyona Medê de di bin navên programên cure, cure de, şerê li başûrê welaî bi saetan munaqesê dibe. Ji kategorî û baskên civata me ji her aliyê Kurdistanê û bi giş zaravayên serekî yê kurdî kesên şareza û pispor dîtinên xwe dibêjin. Li studyo rasterasta û ji cihên dûr bi telefonan kurd û kurdistanî-beşdarê programan dibin. MED-TV bûye navîşana giş kurdan li cihanê û kursiya mehkemkirina altaxî û sîxuriya navxwe. Cih li xayinan teng dibe, ji hawîrdor xelk li wan radibe.

Û li vir li Ewrûpa jî şerê li Başûr, potansiyela li dijî xayintiyê aktîv kir. Em îro bêhtir bi hebûna kurdên Başûr dihesin û em wan zêdetir di nav xwe de dibînin. Kesên kurdên Başûr nas dikin dizanin ku bi vî şerî re çendî neteweyî û kurdistanîbû e. Di nav meşên ku li dijî dagirker û xayinan tene lidarxistin de, di semînar û panelên ku li ser hevkarî û xwepêriya hundir tene çêkirin de, hejmara kurdên Başûr di vî meha dawî de çend qat bûye. Û ev jî destkefteke din ya vî şerî ye.



Birêz Dallaran beriya her tiştî em dixwazin "Rêxistina Efûyê" nas bikin. Kengê ava bûye, li çend welatan hûn bi rêxistin in?

■ Rêxistina Efû ya Navnetewî ango Amnesty International (AI), tevgera serbixwe û alînegir e ku piştevanî û pişt-giriya tevahiya mafên mirovan dike ku di Danzana Mafên Mirovan a Navnetewî de derbas dibin. Rêxistina Efû ya Navnetewî di sala 1961'ê de li Londonê bi pêşniyaz û pêşengiya Parêzer û Hîqûqzan Peter Benenson tê damezirandin. Benenson maqaleyê pêşniyazî amade dike û tê de diyar dike ku ew kesên bi tenê ji bo dîtin û ramanên xwe di girtîgehên de ne, hatine jibîrkirin û divê ew kes tavilê vêga bêne berdan. Piştê jî, ji raya giştî daxwaz dike ku her kes ji rayedarên dewletên cur bi cur re nameyên protestoyî bişîne. Bi vî awayî bi deh hezaran name têne ber destên wî, wî bi xwe jî bawer nedikir ku wê hewqas reaksiyon çêbibe. Ji ber vê yekê jî di salekê de, Peter Benenson 5 şax (şûbe) û 2 jî sekreteriyayan ava dike, dîsa di salekê de ji bo ku der heqê girtiyên ramanên de çavkanî û lêkolînan bi dest bixe li 4 dewletan geştên mîsyonerî pêk tîne û der heqê zêdetirî 100 girtiyên ramanê de jî dosyayan amade dike.

Îro ev rêxistina hanê li 170 welat û herêmê xwedî organîzasyon û saziyan e. Bêhtirî milyonek û 100 hezar kes endam, abone û piştevanên Rêxistina Efûyê ne. Her wiha, li bêhtirî 90 welatî, ji hezarî zêdetir komên wê yên herêmî, meslekî û zanîngêhî çalakîyên xwe girêdayî AI'yê didomînin.

Armanca Rêxistina Efûyê çi ye û xebat û projeyên xwe çawa bi rê ve dibê?

■ Belê.. Ji ber ku rêxistina Efû ya Navneteweyî, li hemberî êrîş û kotekiyên hikûmet û dewletan, welatîyan diparêze, armancên wê jî di wê qonaxê de derdikevin holê. Projeyan dixwe rojevê, lêkolînan dike, kampanyayan li dar dixwe. Di çarçoveya kampanyayan de armancên bi vî rengî derdikevin pêş: Serbestberdana mehkûmên ramanê, ji mehkûmên siyasî re darizandina adil û zû, jiholêrakirina cezayên îdamê, îşkence û nezîktêdayîna xerab li hemberî girtiyên jiholêrakirina 'înfazên bêdarizandin û di bin çav de windakirin' Bi tevî armancên wiha xebat têne kirin. Te got "AI xebatên xwe çawa bi rê dixwe" wekî me li jorê jî got li 90 dewletên Afrîka, Amerîkaya Başûr û Bakur, Asya, Ewropa û li Rojhilata Navîn bi sedan dibistan, zanîngêh, komên meslekî û ji bilî komên din, ji 4000'î bêhtir jî komên herêmî yên Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî hene. Bi mebesta ku prensîba alînegiriyê (tarafsîzîlîkîlîkî) zirarê nebîne, her kom xebat, lêkolîn û kampanyayên xwe li derveyî dewleta ku mensûbê wê ye, li dewleteke din dike. Mijar li gorî egerên coxrafîk û siyasî têne bîjartin. Lêkolînan der barê bînpêkirin û îhlalên mafên mirovan de, ji hêla "Sekreteriyaya Navneteweyî" ku ew jî şaxeke rêxistinê ye tê meşandin.

Divê aliyên şer li gor



din.

Çi hewcedarî ji bo rêxistin û saziyêke bi vî rengî heye?

■ Li cihêkî ku dewlet li hemberî muxalîfên xwe dikeve nav kirinên ne baş, wan dixwe binçav, îşkenceyê li wan dike, wan dîkuje, ji ber fikr û ramanên wan, an jî ji ber sedemên etnîkî û dînî tadeyê li wan dike, bêguman wê li hemberî wan, rêxistinên muxalîf jî derkevin holê, Hewcedariya bi AI'yê jî divê mirov girêdahiya van mijaran binirxîne.

Rêgezên (prensîb) sereke yên Rêxistina Efûyê çi ne?

Îro ev rêxistina hanê li 170 welat û herêmê xwedî organîzasyon û saziyan e. Bêhtirî milyonek û 100 hezar kes endam, abone û piştevanên Rêxistina Efûyê ne. Her wiha, li bêhtirî 90 welatî, ji hezarî zêdetir komên wê yên herêmî, meslekî û zanîngêhî çalakîyên xwe girêdahiya AI'yê didomînin.

■ Prensîbên me yên sereke didu ne, yek serbixwe bûn, didu jî alînegirî ye. Ji bo me ziman, netewe û ola mirovan, raman û dîtinên olî û siyasî qet ne girîng e. Ji bo me her kesê ku mafên wî/wê yên mirovî hatibin bînpêkirin em lê xwedî derdikevin. Em dixwazin heta dawiyê serbixwebûna xwe biparêzin. Ji bo vê yekê jî em tu car jî dewlet, hikûmet û saziyên navneteweyî alîkariya ekonomîk naxwazin û em alîkariya wan napejirînin.

Prensîba alînegiriyê hin caran wekî peydakirina hevkeseyekê di navbera hêzên dijber û dewletan de derdikeve holê. Ev yek di raporên AI'yê de jî tê dîtin. Yanê hin caran ji bo ku hûn xwe alînegir nîşan bidin, hûn ji ber tiştêkî biçûk

bi qasî dewletên ku bi sedan îhlal kirine rêxistinên dijber jî rexne dikin. Hûn dikarin li ser vê nîrxandinê çi bibêjin?

■ Na ne wisa ye. Ji bo me mirovek, rêxistinek an jî dewletek 100 îhlalî jî bike îhlalêkê jî bike ne girîng e, li ba me îhlal îhlal e. Mesela her gav ji me dipirsin "Gelo Tirkiye di listeya reş de ye an jî di warê mafên mirovan de dewleta herî nexweş kîjan e?". Li cem me ev yek tune ye ku em bibêjin ew rêxistin an jî ew dewlet ji yên din baştir e an jî xerabtir e. Em îhlalan naxin nav rêzê, ji bo me tiştê girîng ev e: Îhlal çêbûye an na? Mesela em li hemberî pevçûnên dualî an jî li hemberî şer jî nasekinin. Mesela em beh-

ve danîn. Îro hevalên sosyalîst rexne li me dibarînin û dibêjin ku em îhlalên ku li welatên sosyalîst diqewimin dibêjin. Dema em der barê Amerîkayê de rapora amade dikin jî, wê çaxê em dibin "ajanên komunist", yan kes ji me hez nake, an jî her kes ji me hez dike. Mesela beriya 10-15 salan Ecevit wiha gotibû ji bo Rêxistina Efûyê: "Navê wê çi ye, Rêxistina Efûyê ye çi ye ku der heqê Tirkiyeyê de rapor amade kiriye?" Çavê xwe girtibû û devê xwe vekiribû, reaksiyoneke gelekî tûj nîşan dabû. Lê piştî demekê dirêj, dema Rêxistina Efûyê der barê tirkên Bulgarîstanê de rapor amade kiribû, eynî Ecevit wê gavê spasî û hurmeta xwe pêşkêş kiribû û navê me wiha hildabû: "Rêzdar Rêxistina Efûyê"

AI agahiyên xwe çawa bi dest dixwe?

■ Her çiqas di çapemeniyê de Rêxistina Efûyê mîna ku bi tenê rapora amade dike, tê xuyakirin jî, ne wisa ye, di rastiyê de rêxistin ji du beşan pêk tê: Raporên me, li navendê jî hêla kesên pispor û profesyonel ve tîne amadekirin. Ji milyonekê zêdetir endamên me hene û ew bi xwe van kampanyayan bi rê ve dibin. Mesela agahî rasterast ji kom û şaxên Rêxistina Efûyê re nayê.

Em bibêjin li Diyarbekirê îhlalêk çêbû...

■ Haa, îhlala ku li Diyarbekirê çêbû, mesela kesek hate windakirin, di destpêkê de serî li IHD'yê dide, an jî ebûqatê wî kesî heye û ji xebatên rêxistinê xwedî agahî ye, wê gavê bi riya IHD'ye an jî bi riya ebûqat serî li navenda AI'yê tê xistin. Pêşî ev serlêdan diçe Londonê cem Maseya Tirkiyeyê. Maseya Tirkiyeyê, ji çend deveran ve agahiyê teyîd dike, nav û telefonan bi dest dixwe, bi wan kesan re diaxive. Piştê jî "Bultena Çalakiya

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AI) Özlem Dalkıran: Peymana Cenevreyê tevbigerin

Acil" tê derxistin. Ji bilî van gelek çavkaniyên me hene, em çapemeniya legal û nehênî (illegal) taqîb dikin. Tûristên ku tîn û diçin jî agahiyan dibin û tînin. Li hêla din gelek ebûqat û kesên cur bi cur agahiyan ji rêxistinê re dişînin. Di warê agahî û peywendiyên de balyozxane û dîplomatên dewletan jî alîkariya me dikin. Agahiyan ku ji gelek deveran tînin di gihîjin hev û di bin navekî de enformasyonêk derdikeve holê. Gelek caran pêwistiya lêkolîna di cih de derdikeve holê, wê gavê jî ji Maseya Tirkiyeyê berpirsekê ji bo îhlalê û diçe Diyarbekirê û li ser bûyerê lêkolîna dîke.

Heger der heqê Efûya Navneteweyî û hiqûqa navnetewî de peywendiyekê deynin, hûnê çî bibêjin?

■ Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AI) jixwe li gorî hiqûqê navneteweyî protestoyên xwe li hemberî dewletan dîke. Banga me ya esasî li hemberî dewlet û hikûmetan ev e: "Divê hûn li gorî Peymanên Mafên Mirovan a Navneteweyî tevbigerin" ji ber ku van dewletan peymanên navneteweyî îmze kirine û peji-randine, lewre jî mecbûr in ku di warê demokrasî û mafên mirovan de gavên erênî biavêjin. Mesela di lihevixistinan (şer) de em bang li her du aliyan jî dikin da ku li gorî "Peymana Şer a Cenevreyê" tê bikoşin. Eger dewletek li hemberî kirinê ne baş, îşkence û înfazên bêdarezandî, formên navneteweyî îmze kiribe û peji-randibe, divê êdî nikaribe îşkenceyê bike, eger dewletek îdia bike ku ew endameke civaka navneteweyî ye, divê êdî înfazên bêdarezandî neyên kirin. Mafên mirovan nixê gerdûnî ne nixê gerdûnî jî, bi rêgezê hiqûqa gerdûnî têne birêvebirin.

Ji aliyê abortî ve finansî rêxistinê jî ku tê?

■ Karên Rêxistina Efûya Navneteweyî bi şabaz û aîdatên endamên wê ku li tevahiya cihanê belav bûne tînin finansî- kirin. Rêxistin jî hikûmet û dewletan ne alîkariya malî dixwaze û ne jî qebûl dîke, ji bo parastina serbixwebûna rêxistinê, şabaz (bağış) û aîdatên ku tîne kirin li gorî prensîbên 'Konseya Navneteweyî' bi awayekî hûrbînî tê kontrolkirin.

Li seranserê cihanê peywendiyên rêxistina Efûya Navneteweyî bi kîjan sazî û dezgehên ve heye?

■ Tekilî û peywendiyên me bi awayeke fermî bi ECOSOC (Konseya Ekonomîk û Sosyal a Neteweyên Yekbûyî) UNESCO, OAS (Rêxistina Dewletên Amerikayê, Konseya Ewropayê, OAU (Rêxistina Yekitiya Afrîkayê) û bi Yekitiya Navbera Parlemantoyan re hene û gelek jî xurt e.

Hûn der heqê Qetliama Basayê (Güçlükonak) de gihîştin çî encamî, tiştê ku we kir û hûnê bikin çî ne, li hêla din di derbarê qetilkirina mamosteyan li Xantepe û Mereşê de hûn dikarin çî bibêjin?

■ Mîna komên Tirkiyeyê ku girêdayî



Rêxistina Efûyê ye em nikarin nixandî û şîroveyan di derheqê vê yekê de bikin. Ji ber ku bûyer li Tirkiyeyê çêbûye, ancax ji derve, ji komên dewletên din an jî ji navenda rêxistinê, hin kom dikarin werin lêkolîna bikin, bibin xwedî agahdariyên xurt û herin. Ev yek jî bo me qaîde ne. Lê tiştê ku ez bibêjim ev e ku, der heqê Qetliama Basayê de lêkolîna hatine çêkirin, rapora der heqê qetliamê de hê jî raya giştî re nehatiye eşkerekirin, lê hin kes jî nav gel hatin agahdarkirin.

Di kuştina mamosteyan de jî, Rêxistina Efûyê, dewlet û komên çekdar yê muxalîf bi hin çalakiyan protesto kirin. Ji ber ku ev bûyer jî di sa li vî welatî çêbûye, rasterast me dest neavêt, lê hevalên

Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (AI) jixwe li gorî hiqûqê navneteweyî protestoyên xwe li hemberî dewletan dîke. Banga me ya esasî li hemberî dewlet û hikûmetan ev e: "Divê hûn li gorî Peymanên Mafên Mirovan a Navneteweyî tevbigerin" ji ber ku van dewletan peymanên navneteweyî îmze kirine.

me yê ku di komên cur bi cur ku li dinyayê belav bûne bi şeweyekî hûrbînî li ser bûyerê rawestiyên û gelek zêdetir jî li ser dewletê sekinin. Ji bo me tu ferq di navbera îhlalên PKK û dewletê de tune ye. Ji ber ku îhlal li dijî kîjan sivîlî were kirin ango li hemberî mehkûm û girtiyên îhlalê çêbibe, em şermezar dikin, em dixwazin ku di navbera her du hêzan de jî şer çênebin, aşî herdem serdest bibe û îhlal çênebin.

Lê belê ev yek jî heye ku 2-3 caran aliyekî şer (PKK) jî bo ku şer bisekine agirbest îlan kir, lê mixabin dewlet qetguhê xwe neda van bangan. Heta demê berê jî PKK 'ê jî raya giştî re bang kiribû ku wê ew jî bo tevahiya şertên

"peymana şer a Cenevreyê" tevger bike...

■ Min berê jî gotibû ez tevî bersiva vê pirsê, bersivên pirsên der heqê Tirkiyeyê de nadim. Divê bersivên pirsên bi vî rengî komên Rêxistina Efûyê yê dewletên din bidin.

Nexwe hûn der heqê girtina Şanar Yurdatapan de jî tiştê nabêjin. Bi vê pirsê re jî girêdahî, tewra rêxistinê der heqê Mamosta İsmail Beşikçi de jî sosret û balkêş e. Beriya demê Akın Birdal, Ünsal Özkök û Av. Levent Kanat li Swêdê, di kampanyaya 'Kampanyaya Beşikçi' de, jî berpirsên Rêxistina Efûya Swêdê daxwaz kirin ku ew Beşikçi mîna

'girtiyê ramanê' bipejirînin, lê mixabin ev yek jî hêla rayedaran ve nehatibû peji-randin û gotibûn ku "Beşikçi jî bo ku di nivîsên xwe de piştvanîya PKK'ê dîke, hatiye girtin."

■ Belê wekî ku te jî got, der heqê girtina Şanar Yurdatapan de jî em şîrove û nixandinan nakin. Lê lêkolîna û agahdarî li ser girtina Yurdatapan hatine kirin û ji navenda rêxistinê re ev agahî û enformasyon hatine şandin. Piştî nixandina rêxistinê wê raporek jî were amadekirin.

Ji bo Beşikçi jî ez naxwazim bikevim nav nîqaşê, jixwe tiştê ku Berpirsê AI'ya Swêdê Anîta Klum û Dîrektora Maseya Tirkiyeyê İngrid Falkayê, ji heyeta ku çûbûn Swêdê re gotibûn, diyar e.

Nexwe gotinên wan, we jî eleqedar dîke, ango gotinên wan ên we ne jî?

■ Eleqedar dîke an jî nake. Tu dixwazi min bikişîni nav mijarê, lê ez vê yekê jî nîqaş nakim

Em werin ser operasyona Başûr. Dagirkirina başûrê Kurdistanê jî hêla Artêşa Tirk ve û qetliama ku PDK'ê li Hewlêrê li dijî kesên sivîl pêk anibû li holê ye. Cihê van bûyeran di nav normên hiqûqa navneteweyî de li ku derê ye?

■ Der heqê operasyona Başûr de, rêxistina Efûyê rapora xwe weşand. Tewra rêxistinê di vî warî de diyar bû, alînegirîya xwe di sa parast. Rêxistin nabêje bila operasyon çêbe an jî çênebe, lê di operasyonên bi vî rengî de, xem û metirsiya me ya herî mezin ewlehiya sivîlan e. Ewlehiya can jî bo me tiştê herî pîroz û girîng e. Di operasyonê de me xwest ku bi awayekî zûtîrîn kesên ketine binçav werin qeydkirin, malbatên wan werin agahdarkirin, her wiha ebûqatê wan jî. Di operasyonê de hate dîtin ku gelek gund, cihên sivîl, bi mebesta operasyonê hatine valakirin. Çawa ku ew der bûbe qada nîşangehê (poligon) tevger hatibû kirin ji hêla hêzên dewletê ve.

Li Tirkiyê û Kurdistanê êrişên li hemberî çapemeniyê her ku diçe zêde dibin. Der heqê vê yekê de helwesta we çî ye?

■ Beriya her tiştî, êrişên bi vî rengî li hemberî mafê agahdarbûnê ne, êrişên wiha kirinên bêmantîq in. Daxwaza kesên ku berjewendiyên wan di talûkê de ne, libergirtina belavbûna agahiyan e. Nexwasim êrişên çekdar îhlalên mafên mirovan ên herî giran in.

Binefsa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî -III-

Wê demê Omo jê re dibêje: "Paşayê min ez ne Cembelî me, ez serkarê mala Cembelî me, axayê min jî ne li mal e, çûye herba Semertaşê, eger qisûreke me hebe jî divê tu bibaxşîni, bidî binê lingê xwe." Kethan Paşa jê re dibêje: "Omo, lawo helal be ji te re û axayê te li vir bûya gelo wê çawa bûya." Xatir ji Omo dixwaze û ji êla wan derdikeve û tê mala xwe. Ew qizika ku pê re şert girtiye tîne pê re dizewice, dawêta xwe dike û bi mîrazê xwe şa dibe.

Omo jî dîsa xatiya êlê di dewsa Cembelî de dewam dike. Di navberê re zêman derbas dibe, Cembelî ji herba Semertaşê vedigere tê. Gava tê perê êla xwe, êla wî tev tîne pêşiya Cembelî, Cembelî di nava êlê de çavên xwe digêrîne, bala xwe didê ji heft saliya heta heftê saliya herkes hatiye, lê Omo di nav de tune ye. Cembelî xwe ker dike û dengê xwe nake, bala xwe didê herkes hatiye, dîsa Omo di nav cimâtê de tune ye. Radibe mirovêkî dişîne pey Omo. Ew mirov tê ber derî, Omo dibêje: "Ez nayem mala axa." Mêrik ji mala Omo vedigere tê cem Cembelî dibêje: "Axayê min Omo dibêje ez nayem mala Cembelî."

Axa radibe careke din qasidekî dişîne mala Omo, Omo careke din ji qasid re dibêje: "Here ji axê re bibêje, Omo gotiye lezekî (gaveka) din ezê bi rê bikevim, werim."

Omo radibe berê xwe dide mala axê, tê derdikeve hizûra axê. Axa jê re dibêje: "Omo, ev çi yek e tu tîni serê min! Min êla xwe teslîmî te kiribû, ez çûm herbê, ji herbê vegeyriyam hatim, tu nehatî merhebatî neda min?"

Omo jê re dibêje: "Axayê min şertekî min heye, eger tu şertê min qebûl bikî; ezê li cem te bisekinim, eger tu qebûl nekî, ezê êla te terk bikim." Axa jê re dibêje Omo: "Ka şertê xwe bibêje, şertê te çi ye? Gava ku min şertê te qebûl nekir dîsa êla min terk bike."

Omo jê re dibêje axayê min, ezê te bizewicînim; ger tu qebûl bikî ezê li cem te bisekinim, ku tu qebûl nekî, ezê êla te terk bikim, herim. De tu min nas dikî, ez aşiq Omo me, roja ku li min teng were; ez deqê bi sedî me.

Axa jî jê re dibêje: "Omo, gava ku tu min minasibî qizekê dibînî ez jî qebûl dikim." Li ser vê gotinê dilê Omo jî rehet dibe, ji şabûna ew şev heya sibê xew nakeve çavên Omo. Dibe sibe, Omo tê hespê Cembelî ji tewlê dikîşîne û li ser piştê hespê siwar dibe, ya xaliqê alemê mirov qemîş nake li hespê mêze bike. Omo jî êlê dertê pê de pêde dikeve bajar û gundan, diçe mala axa û bega û digere nagere qizêke minasibê axayê xwe nabîne. Hew qas qizên axa û began dibîne tu qizê jî begem nake. Bi dilekî kul ji paş ve vedigere, tê ku were nava êla Cembelî, tê perê mîrga Tewrêzê, bala xwe didê hinek kon di nava mîrgê de vegirtî ne. Xwe bi xwe dibêje eheyran ev mîrga axayê min e, ev erdê Cembeliyê Mîrê Hekariya ye, ev kî ne ku ji Cembelî na-

tirsin, hatine di nava mîrga wî de konên xwe vegirtine. Gava difikire dibê yeqîn ev mirtîb in, hatine kon vedane. Bise ez herim ji wan re bibêjim bila konên xwe ji wir rakin, ew ê nava mîrgê tijî kevir bikin û tevî xera bikin. Gava Omo xwe ji jor de berdide nava çadîran bala xwe didê di nava çadîran de li ser kaniyê qizêk satila xwe tijî av dike. Gava çavên Omo bi qizêk dikeve dibê bi xwedê min ji axayê xwe re qizêk dît. Lê belê ez bi vê bihesim, ev qiz an jî bûk e. Omo li wê derê gazi keçikê dike:

De lêlê Xanimê dilê min dibê ye,
delalê dilê min dibê ye
Ev heft roj û şevê min in, ez li rê ser
piştê hespê ye
Di devê vê heywanê de neçûye
çenga

avê ye
Tuyê elbê tije
av bike bine
dayne ber vê
heywanê
Xwedê ye
Bila nebiheçê ji ber
tibûna avê li
vê derê ye

Qizik
g a z î
O m o
d i k e
û j ê
r e
d i -
b ê -
j e:
De si-
w a r o
d i l ê m i n
d i b ê y e,
s e d c a r a
d i l ê m i n d i b ê
y e

Lê hespê binê
te hespê axa û
paşatiyê ye
Lê gava meriv
li siwarê ser
piştê hespê
mêze dike mî-
nanê mirtîbê
çolê ye

Omo lê vedigerîne:
De lê lê keçikê dilê min dibê ye
Ez ê li bejn û bala te mêze dikim, bejn û
bala te mîna dara çilûrê rast û çep li
hevdu tê ye
Ezê li dey û lêvê te mêze dikim mîna
dev û lêvê devê ye
Ezê li pozê te mêze dikim mîna dikulê
qotanê ye
Minê digot qey tu qîza êl û eşîrê ye
Min nizanibû tu qîza mirtîbê çolê ye
Diranên te mîna mixê İngilîzî mirov bikişî-
ne ji dera mezî ye

Îcar qizik gazi dikê:

Di siwara dilê min dibê ye
Ezê keçime ber bextê te û Xwedê ye
Tu yê çawa ji min re wiha dibê ye
Ma qey Xwedê çavên te kor kiriyê li
dinê ye
Ma tu nabînî bedewbûna Binefsê ye?
Qirika min mîna şûşa lambê ye
Ezê dibiriqim mîna zîwana dora rojê ye
Bejn û bala min mîna sipîngdarê ye
Mîna gûl û sosinê ku vebe li serê çiyê ye
De tu bidî xatirê navê Xwedê ye
Tu yê navê min xera neke, qisûra ji min
re çêneke li dinê ye
Ezê elba avê bidim ber hespê te,
tu were rûnê li pêşiya kon
ezê ji te re çêkîm çay û qehwê ye

Vê demê Binefs elba avê dide ber hespê Omo, hesp avê vedixwe, Omo xwe ji jor de berî nava kona dide. Tê li derê Fariz Begê peya dibe, bala xwe didê kalekî li derê kon rûniştîye, selamê dide kalo, kalo selama wî vedigere û mînderêkê ji Omo re datîne, Omo li ser mînderê rûdinê û ji kalo re dibêje: "Mîrê mi, ezbenî, ev mîrga han mîrga Cembeliyê Mîrê Hekariya ye, wê ji kê destûr standiye, hûn hatine wê konê xwe di vê mîrgê de daniye? Hûn kî ne, ji ku de tîni û ku de diherin?"

Kalê jê re dibêje: "Lawê min em xerîb in, me xwe li Xwedê girtiye û li Cembeliyê Mîrê Hekariya girtiye, em hatine me di mîrga wî de konê xwe daniye. Eger ew anîha jî bêje ji mîrga min derên herin, em qet nasekinin û emê herin. Navê min Fariz Beg e, ev jî êla min e."

Wê çaxê Omo jê re dibêje "Axayê min ez serkarê mala Cembelî me, hûn heya li vir bin, tu kes nikare nêzîkê we be. Eger daxwaziyên we hebin hûn ji min re bibêjin, ezê ji axayê xwe re bibêjim, wê axayê min daxwaziyên we pêk bîne." Omo çay û qehwê vedixwe û xatir dixwaze û li hespê xwe siwar dibe, bi rê dikeve. Bi dilekî şahî vedigere cem Cembelî, tê derê malê peya dibe, derbasî diwanê dibe, gava ku dikeve hundir Cembelî ku li reng û rûyê Omo mêze dike, Omo devbiken e, dibêje: "Omo xêr e, te çi kir?"

Omo dibêje: "Mîrê min kar tamam e, min ji te ra qizêke wîsa bedew dîtîye, qizêke wekî wê bedew hê nehatiye dinyayê." Cembelî pirs dike, dibêje: "Omo, ji ku derê ye, qîza kê ye, navê wê çi ye?" Omo

jê re dibêje: "Mîrê min, navê qizikê Binefs Xanim e, navê bavê wê Fariz Beg e, ji wê latekî xerîb hatine, li mîrga Tewrêzê kon vegirtine. Ez çûm navê konê wan, min ji wan pirsî, Fariz Beg ji min re got: Min xwe li Xwedê girtiye û xwe li Cembeliyê Mîrê Hekarî girtiye, ez hatime vir." Cembelî ji Omo pirs dike dibêje: "Te çi bersiv da?" Omo dibêje: "Mîrê min, min jê re got tu heya li vê derê bî, tu mêvanê axayê min? Tu kes nikare di bin siya te re derbas bibe? Çi daxwaziyên we hebin ji min re bêjin, wê axayê min daxwaziyên we pêk bîne." Omo dibêje: "Axayê min tu tevdira xwe bibîne em sibê rabin herin nava êla Fariz Begê, ji bo dîtina Binefs Xanimê." Cembelî radibe tevdira xwe dibîne, rûyê xwe kur dike, destê kincê paqij li xwe dike, bi Omo re li hespa siwar dibin, berê xwe didin mîrga Tewrêzê, diçin navê Fariz Beg, gava xwe jor de berî nava konan didin; bala xwe didiyê di binê konan de şerekî pir mezîni heye. Li aliyekî heft heb in, li aliyekî jî pêncî heb in. Cembelî ji Omo re dibêje: "Gelo ev kî ne li hev du dixin û ji bo çi li hev dixin?" Omo jê re dibêje: "Mîrê min di navbera van de meseleyeke girîng heye, ka em herin nava konan, em ê bi meselê bihesin."

Gava Cembelî xwe berî nava konan dide, bala xwe didê Binefs Xanim li ber derê kon sekiniye, li şerê her du aliyan temaşê dike. Dema Cembelî çav bi Binefs Xanimê dikeve hiş û eqil di serê Cembelî de namîne. De ya xaliqê alemî mirov gava li bejn û bala Binefs mêze dike, mirov di qirika wê de şiklê xwe dibîne. Dilê Cembelî bi dilekî, na bi bistî û çar dilan dikeve Binefsê. Cembelî wê demê gazi Binefsê dike û jê re wiha dibêje:

Lê lê xatîne dilê min dibê ye
Delalê dilê min, dibê ye
Tu negirî, hêsira jor de neniqutîne
li ser suretê sor û sosinê

li vê derê ye
De tu were ji min re bêje mesela vî şerê
hane ye, ev şerê kê û kê ye?
Bi dengê Cembelî re Binefs gava serê xwe dizivirîne, bala xwe didê siwerek li ser piştê hespê sekiniye, mirov qemîş nake li siwar binêre.

Binefs jî bi dilekî na bi hezar dilî Cembelî dihebîne. Binefs gazi Cembelî dike û jê re wiha dibêje:

Siwara dilê min dibê ye, ez bi qurbanî
lê min dibê ye
De tu were peya be li derê konê
Fariz Begê

Ezê ji te re deynim mînderê ye
Ezê ji te re çêbikîm çay û qehwê ye
Tu ji xwe re bike kêf û zewqa dinê ye
Tu guh nede şerê nava mîrgê ye
De lorî lori de loooooorî lorî

BERHEVKAR: SERVET YÜKSEL





Li navendên çandê çalakîyên vê hefteyê

Li NÇM'ya Stenbolê

● **06.07.1997 Yekşem:** Panel û Pêşandana Sînevîzyonê: "Pela ku yekemîn ji dara azadiyê weşiya (Düşen İlk Yaprak)" Vedat Aydın û Serhildana Amedê.

Panelîst: Şükrü Aydın, Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Hamit Geylani, Serokê bajarê Stenbolê Hikmet Fidan, Rêveberên IHD'ê Haydar Güleç, Veysi Aydın. saet:14.00

Konser: Koma Agirê Jîyan saet:18.00

● **11.07.1997 În:** Beşa sînemayê: Film "Acı" JanDerhêner: Yılmaz Güney, saet: 18.00

● **12.07.1997 Şemî:** Konsera Koma Çiya saet:14.30

"Stranên me ji bo te Ali Temel"

Panel û Konser

"Ne takunya, ne postal, yaşasin halkın iktidarı (Ne taqunya ne ji postal, bîjî desthilatiya gel)". Amadekar: Dîreniş Gazetesi ve Grup Yankı. saet:18.00

Li NÇM'ya İzmirê

● **06.07.1997/Yekşem:** Çalakî: Bugün yine Sivas (İro dîsa Sêwaz)

Semah Grubu Tunceliler Der. Müzik Grubu, saet:18.30

● **12.07.1997/Şemî:** Konsera Koma Agirê Zerdest saet:19.00

AWIR

Divê em zarokan jî bifikirin



Belengazî, rebenî, tevkujî, sirgûn û koçberî, birçîtî, pêxwasî û tazîbûn, bûye qedera zarokên bê cih û war û bê welat ku nikarin bi çavên zarokîyê li xwe binêrin.

Însanê ku zarokîyê nebîne, bi listîkên zarokan qet nelîze, û di nav zarokan de xwe jî weki zarokê nehesibîne, bi qedr û qîmetê zarokîyê tu carî wê nizanibe. Belê di mercên îro de gelek zarok ji mecburî nikarin zarokîya xwe bijîn, ji ber ku ew mafê wan î zarokîyê jî wan hatiye standin. Her wiha digel ew qas tiştan jî hin zarok hene ku ji bo mafê xwe yî zarokîyê li dijî dijminê xwe rabûne û doza jiyana xwe yî zarokîyê dikin. Ev tişt jî bi hin çalakîyan pêk tê.

Roja şemiyê 29.6.1997'yan de Komeleya Mafên Mirovan ji bo hemû zarokan şahiyek li dar xist. Şahiyeke bi dilê zarokan ku zarok xwe ji dil weki zaroka bibînin, her yekî/ê firfirokek da destê zarokan.

Ji bo zarokan bi destpêka havînê jî listikeke di cih de be. Nêzikî 500 mirovî li cihê şahiyê civiyabûn, ji wan 200 heb zarok bûn.

Zarokan kincê xwe yên xweşik, bi solên xwe yên sor, bi porgirêdankên xwe yên ku bi gulan hatibûn xemilandin, bala her kesî dikişandin. Zarokên li şahiyê hinek ji wan di bin siya darê de bi dê û bavê xwe re rûniştibûn, ên

din jî derketibûne cihê bilind firfirokên xwe difirandin. Ew roj ji bo zarokan rojeke taybet bû, wê rojê dinya, ya wan bû. Her tişt jî bîr kiribûn, bi tenê kêfa wê roja taybet derdixistin. Di şahiyê de gelek rojnamevan jî hebûn. Zarokên siyasi li hemberî objektîfan îşareta serfiraziyê dikirin. Her wiha carinan xuya dikir ku zarokan zarokîya xwe jî bîr dikirin. Zaroka tiştên ku ji mezinê xwe hîn bûbûn ji rojnamevanan re digotin, hinekan li ser pirsên rojnamevanan bi zimanekî ku ji wan nedihat hêvîkirin "Em aştiyê dixwazin" digotin.

Belê di şahiyê de palyaçoyan jî bi henekên xwe dilê zarokan şad dikirin. Wekî din xortên ku hatibûne şahiyê bi dîlan û stranên kurdî reng didane wê rojê. Her wiha dê û bavên zarokan û kal û pîran jî di bin siya darê de xwe ji germa tavê didan aliyekî.

Li aliyê din IHD'yê jî bo zarokan stand vekiribûn. Di standan de tiştên zarokan, wekî firfirok, pirtûkên zarokan û hwd. difirotin.

Çalakîyên wiha ji bo zarokan gelekî baş in, bi rastî gava behsa şahiyê dibû tu carî zarok nedihatîn bîra me, lê ji îro bi şûn de divê zarok jî di şahiyên de bêne bîra me. Her wiha di têkoşîna li dijî sîstem û politîkayên Tirkîyeyê de jî divê bi zarokan re têkilî bîr danîn, ev yek ji bo pêşerojeke xweşik pêwîst e.

AZAD AVAŞIN

TÎŞK

LERZAN JANDİL



Avê şiyena qoman de rolê medya

Destcikerdena nivisa xo de ez wazena qetîamê Sêwaziyo ke 35 kesê ma amê vêşnayene 2 temûzî reyna lanet bikerî û sare werdaydayena guretiyan 14 temûzî, sare wedardayena Koçgîrî ebi rûmet û qedr biyarê re xo û wendevanan vîrî.

Bêguman avê şiyena qoman de rolê medya, nînan ra jî rolê televîzyon û rojnamevanan bi qedr o. Sebeta ke qomê ma de na derheq de, zafêrî jî rojnamevaniye de problemî estê, ma wazenîme ewro na me meselaye ser ro vinderî.

Rojnamevan û rojnamevaniye ewro gelê avê şiya. Her çîqa ke gelê cayan û welatan de rojnamevan û rojnamevaniye teyna ebi talîmatanê serdestan, koledaran, tîranan, angorê îdeolojiyê resmî xebitîne, hemverê avêşiyen, mafê mordeman, şaran û şenikatiyan de vecîne jî, ma qalê nê rojnamevan û rojnamevaniye nêkenîme. Na rojnamevan û rojnamevaniya îdeolojiyê resmî de, zê Tirkîye, Îran, Sovyeto kan ûêb, çîne. Rojnamevan û rojnamevaniya kewazenê wayîrê nê rengdaran bê jî, ênê ceza kerdene.

Ma ke qalê rojnamevan û rojnamevaniyê kenîme, na rojnamevan û rojnamevaniya demokrate ke prosesê (demê) avêşiyayena xo de ebi ked û emegê emegdarana xo şiya wa. Rengdarê (sifat) na rojnamevan û rojnamevaniye jî ganî ebi kilmîye zê nê cêrnan bê:

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî viraziyena û viraştene firqê qoman de rolêde pozîtif, eşkera, rakerde û ilmî kay bikero.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî viraştene mentalîtaya toleransî de, demokrasî de, perwerdekerdena demokrate de, têlewede jiyaneyan qoman û şenikatiyan de wayîrê tesîrê de girsî bo.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî viraştene kesîtiya qoman de rolê yew/jû biyene kay bikero.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî viraştene ehlaq û xuya qoman de, ehlaqê qedênayene (tûketim) de raya rinde û raşte qoman musno.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî cayê xo lewê raştê de bigêro. Na jî êna a mana, ke Rojnamevan û rojnamevaniye ganî lewê bindestan, lewê mazluman de ca bigêro.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî qedr û qîmetê şexsiyetê kesan, grupan, qoman û şenikatiyan bizano, rûmet bidêro nînan.

Rojnamevan û rojnamevaniye ganî bê sebeb, bê binge, bê reşerşe (warê rojnamevaniye de ere raştîya çîye gêrayene (cêrayene) êrîşe kesan, gruban bawariyanê cudayan mekero. Rojnamevan û rojnamevaniye ganî xo hem ebi otokontrol, hem jî ebi kontrolê wendevana kontrol bikero. Rojnamevan û rojnamevaniye ganî hemverê qomî de, kesan de, grupan de wayîrê verpersî (berpirsiyê) bo.

Ewro ma niya danîme, şenik bê jî, yew dide bê jî rojnamevanê ke angore nê prensîbanê rojnamevaniye nêxebetîne estê.

Mordemek rojnamevan o, çî êno verê feki vano. Qe nêfikirîno, ke çîyo ke vano, raşt o yan jî şaş o? Heqa xo esta yan jî çîna, çiyêde niyanên vaco?

Zaf organî estê: Mordemek bê binge, bê zanayen û analizîde ilmî erzeno re yew dîni, erzeno re yew grube, erzeno re kesan. Çîyanê şaşan nivisneno. Derheqê çiyêde hîrê kesî nivisnê, la belê tariq/datumê nînan jî derheqê eynî çî de yebînanî nêcêno. Ebi nameyê rexneyî êrîş re kesîtiya mordeman heta grupan kenê. Zamet nêken, o newaneno, la belê zaf tûj 'rexne' kenê. Ebi omganana zaf derg mekêrîme. Her kesê ma nînan vînenê, waneno û zano.

Sebeta ke dem nazik o, rojeve tim vurîna, çiyê tayîna bingeyîni benê, mordem nêwazeno yan jî dem nêvînenê, nê organ ser ro vîndero, demê xo de reaksiyon ci musno. La belê ganî nê kesî jî êndî bêre re xo. Ferqa xo û rojnamevananê koledaran, ferqa mentalîtaya rojnamevaniya bindestan û koledaran ganî bizanê.

Evîna Mele

Hebû tunebû dema pîrê jîr bû, kalo pîr bû, di dem û dewrane-kê de meleyekî rind û pak hebû. Cîranekî mele yî drûnker hebû. Her ku mele diçû mizgeftê di ber mala drûnker re derbas dibû. Her ku derbas dibû jina drûnker li hewşê bû. Demek hat êdî her ku mele jina drûnker didît, dilê wî xweş dibû, hêdî hêdî êlma wî ber bi jina drûnker Beyazê ve dadigeriya. Êdî ne dema bangê bûya jî rîya xwe bi mizgeftê dixist û vedigeriya. Demek hat êdî mele xwe winda dikir, ji bêhişî jî dêleva "Heyalel telah", digot: "Heyalel Beyaz"

Rojekê ji xwe re fikirî got: "Weleh wiha nabe, divê ez bi Beyazê re bipeyivim." Meletiya xwe li aliyekî danî, dev li dilê xwe kir û ji Beyazê re got: "Wiha ez ji bo te har û dîn dibim, divê rojekê ez û tu hev û du bibinin." Beyazê got: "Mele ev çawa dibe, ma ne ez bi mêrîm û tu jî mele yî? Ma wê mirov ji me re nebêjin çî?" Mele got: "Qet nabe, weleh ezê dîn bibim û bi çolê bikevim." Beyazê got: "Ka emê çawa bikin, divê em mêrê min bixapînin ji bo şevêkê." Mele got: "Ew karê min e. Binihêre îşev heke mêrê te hate malê, xwe têxe nava livîna û xwe nexweş bike. Dema mêrê te pîrsî, bibêje weleh ez nexweş im û dermanê min jî mele zane pê. Wê demê ez zanîm ez çî dikim."

Wê rojê bû êvar rebenê terzî hay û baya wî ji tiştêkî tune ye û tê malê. Dinihêre ku jina wî di nava livîna de ye. Jê re dibêje: "Keçê ev çî bûye ji te mozê." Ji dêleva bibêje Beyazê an bozê hema bi kurtayî digot: "Mozê"

Beyazê got: "Weleh ez nexweş im û halê min tune ye. Divê tu ji min re çareyekê bibînî yan na ezê koç bikim ji vê dinê."

Mêrik got: "Eman îcar ev ji ku derket? De ka ezê çî bikim?"

Feqa ku Beyazê vegirtibû mêrê wê kete û êdî pêde çû. Jê re got: "Weleh dibêjin meleyê me dermanan çêdike, de here zû wî bîne bila li min binihêre." Rebenê drûnker zû zû çû bangî mele kir û anî ser nexweşa xwe. Mela hin pîrs ji Beyazê kir û zivîrî ser mêrik.

Jê re got: "Binihêre weleh jina te pîr nexweş e û hew dermanekî wê heye." Mêrik got: "Mele de ka zû bibêje çî ye ev derman?"

Mele got: "Wele gihayek heye û navê wî, gihayê xulxulê ye, divê tu vî gihayî bîne yan na nabe."

Mêrik got: "Ê ka ev gihaya li ku ye, ji min re bibêje ez herim bînim?"

Mele got: "Weleh dibêjin ev gihaya li ser Çiyayê Qaf pêde dibe, wekî dîn li tu deveran tune ye. Heke tu karibe, here bîne?! Mêrik li jina xwe nihêrî û li mele nihêrî. Jina wî nale nala wê ye û Mele jî niçenîça wî ye. Ji neçarî got: "Bavo heke li ku dibe, bila bibe weleh ezê herim bînim."

Cuhêrê xwe bi milê xwe de kir û berê xwe da çolê. Tobe heram be heke di-

zane Çiyayê Qaf li ku ye û gihayê xulxul çî ye. Di nava zeviyên de bi awayekî dilşikestî dimeşiya û diçû. Li nava zeviyên, di ber bîstaneke re, derbas dibû.

Weleh jina min nexweş e û mele hat lê nihêrî û Quran vekir got: "Elîf û bê û qaf, divê tu herî paş Çiyayê Qaf, qey gihayekî xulxul heye, ew dermanê nexweşiya jina te ye."

Pîrê got: "Kurê min hela we-re rûne."

T u



Nihêrî ku pîrê jî ber bîstaneke.

Dema çû ba pîrê, jê re got: "Pîrê qewet be ji te re." Pîrê got: "Xwedê jî te razî be lawo, ma tuye bi ku de herî, vê tava havînê, vê germê?" Mêrik got: "Pîrê qet nepirse, wele Xwedê boblatek raserî ser min kiriye, ez jî nizanim ez bi ku de diherim." Pîrê got: "De ka bibêje êşa dilê xwe, dibe ku ez zanibim dermanê te." Mêrik got: "Ma pîrê tuye ji ku zanibî dermanê min?"

Weleh jina min nexweş e û mele hat lê nihêrî û Quran vekir got: "Elîf û bê û qaf, divê tu herî paş Çiyayê Qaf, qey gihayekî xulxul heye, ew dermanê nexweşiya jina te ye."

Pîrê got: "Kurê min hela we-re rûne."

T u

dengê xwe neke. Binehêre tu têkeve vî kîsê hanê û ezê te li pişt xwe bikim, tu qet eleqedar nebe."

Pîrê rabû terzî xiste hundirê kîs û li pişt xwe kir, berê xwe da mala terzî. Bi awayekî feqîr û belengazî li deriyê Beyazê xist. Êdî êvar bû jî. Jina terzî Beyazê jî Mele vexwandîye û sifreya xwarinê amade kiriye. Tenê şîrê çivîkê kême li ser sifreyê. Ne pîrê, kî be derî lê venake. Pîrê jî hey li derî dixê. Beyazê jî neçarî hat ber derî got: "Ew kî ye?" Pîrê got: "Ez im qîza min. Weleh ez feqî im ji xwe re li parsê digerim. Bi Xwedê îşev tu deverê ku ez herimê tune ye, divê tu min bihewînî."

Beyazê got: "Weleh qet nabe, mêrê min ne li malê û dema çû jî got: "Divê kes neyê mala me." Pîrê got: "Qîza min weleh tu cih û dever nema ku ez lê negeriyam. Kesî ez nehewandim. Heke tu min nehewînî ezê jî aha ji xwe re li ber deriyê te razêm."

Beyazê jî neçarî derî li pîrê vekir û jê re got: "Binehêre ezê te bihewînim, lê belê heke çî di hundirê mala min de qewimî, divê tu dengê xwe nekî." Pîrê got: "Qîza min ez feqîr û belengaz, ma çî karê min bi qewimînê hundirê mala te heye. Aha lihêfekê tenê bide min û ezê ji xwe re li qozîkê razêm."

Pîrê rahişte lihêfa xwe û li qozîkek malê raza. Lê belê guhê wê li derî bû. Bêhnek derbas bû, nihêrîn ku teqeteqa derî hat. Beyazê zû bazda ber derî, derî vekir û mele derbaşî hundir kir. Pîrê û kîsê wê şaş û metal mabûn. Bi rastî pîrê şaş nebûbû, lewre qermîçokên eniya wê, yên sêla berfa sor bûn.

Beyazê û mele li ser sifreyê rûniştin û dest bi xwarina xwe kirin. Ji şorbê bigire, heta mehrê, ji qeliye bigire heta meyê giş hebûn li ser sifreyê. Bi kêf û şahî xwarina xwe qedandin. Di dû xwarinê de mele got: "De ka emê îcar bîstekê bilîzin, dilanê bikin." Beyazê û mele rabû dane lotikan. Ji aliyekî jî mele di ber re distira digot:

*Tirna nîna tirna nîna
Bi wê Qurana ez dixwîna
ev gihayê xulxul
ne li vir û ne li Behdîna*

Pîrê bi vê stranê Mele xwe ranegirt û lihêf ji ser xwe avêt û rabû got: "Weleh ezê jî bilizim. Ji xwe min di temenê xwe de şahiyek wiha nedîtiye." Ne hişê Mele li serî bû û ne yê Beyazê, qet guh nedane pîrê. Pîrê jî da lotika û bi stran avête ber Mele:

*Hey lo kîso kîşê pîso
De rabe lo tu çî heşîso
Rabe êdî dem hat
Ji xwe re binehêre li vî karê pîso.*

Mêrik rabû kîs çirand û êrîşî Mele kir.

ÇIYA MAZI

Ji Ciwan Haco kaseteke nû

Kaseta Ciwan Haco a dawîn bi navê "Bilûra min" ji aliyê şirketa Kom-Plak ve hate belavkirin. Li ser bergê kasetê navê stranên hatiye nivîsandin. Bi giştî di amedekirina kasetê de mûzîkarên profesyonel yê biyan xebat kirine.

Gava em bi awayekî giştî li vê kasetê binêrin ne berhemeke wekî berhemên din balkêş e. Di kasetê dawî de Ciwan Haco ritm û meqamên kurdî zêde bikar neanîne. Digel vî qasî kesê ku berê li xebatên Ciwan Haco guhdarî kiribin wê li cudahiyeke rast bîn. Ji aliyê strîn û bi karanîna amûrên mûzîkê ev yek diyar e.

Di kasetê Ciwan Haco ya "Sî û sê gulle" ritm û meqamên kurdî baş hatibûn bikaranîn. Di kasetê "Dûrî" de li gorî "Sî û sê gulle" formên mûzîka ewrûpî behtir derketibûn pêş. Kaseta Ciwan Haco ya dawîn "Bilûra min" ji kasetê Dûrî baştir xuya nake. Ji vê kasetê bêhna romantîzmê, jaz, rock û popê hê zêdetir tê.

Ji ber ku amûrên ku li muzîka kurdî tînin, derneketine pêş, ev yek jî dike awazên di kasetê de ji rengê muzîka kurdan dûr bikeve. Lê mirov dikare vê nixandîne jî bike ku ew muzîk û awaz ji bo kurdan çêjê nû ye.

Stranên ku di kasetê Ciwan Haco de cih girtine: Dest, Nexta Nazê, Bêje, Hêy hey, Dersîm, Xatûn, Zînê û Bilûra min. Gotinên strana ku navê xwe daye kasetê jî hêla Celadet Bedirxan ve bi nasnavê "Seydayê Gerok" hatiye nivîsîn û di kovara Hawarê de hatiye weşandin.



Hejmara duyemîn a Zendê

Kovara Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Zend piştî demeke dirêj derkete pêşberî xwendevanên û lêkolînerên kurd. Di hejmara duyemîn a kovara Zend de nivîs û wergerên lêkolînî-yên li ser zimên, dîrok û çand û mijarên din ên zanistî cih digirin. Bo nimûne Mehmet Demir li ser computerê bi navê "Jawa" nivîsek amade kiriye, ew nivîs jî tirkî hatiye wergerandin. Dîsa nivîseke Laurie Grace li ser "Metamatîk Duyatî" jî îngilîzî hatiye wergerandin.

Her wiha teblixên Mehrdad Izady û M. Can Yüce yê ku ji Konferansa Dîrokê ya Înstîtuya Kurdî re hatine şandin, yek jî îngilîzî, yek jî tirkî hatine wergerandin û di kovarê de cih girtine. Hin nivîsên ku bi kurdî nivîsandin jî mirov dikare wiha rêz bike: "Di Dema Selcûkî û Osmanîyan De Ji Dîroka Kurdistanê Dîmenek" (Şareza Aver), "Ava Welatê Bêxwedî" (Felat Dilgeş) û "Di Kurmancî De Guherîna Dengan" (Zana Farqînî), "Çend Niwîsraw we Belgeyî Zimannewanî Dewranî Sasaniyekan" (Ehmed Şerîfî) û "Bi Zarawayên xwe Ve KURDÎ" (Torî).

Digel van nivîsên lêkolînî, hinek hevpeyvîn jî di vê hejmara kovarê de hene. Aliyekî balkêş ê van hevpeyvînan ev e ku her yek bi zarawayekî kurdî ye. Hevpeyvîna Munzur Çem "Zulûm 38'î Ra Dima Kî Kêm Nêbî" bi kirmanckî, hevpeyvîna bi hunermend Mehmet Salayî re bi kurmancî û hevpeyvîna bi Enwer Qeredaxî re bi kurmanciya jêrîn (soranî) e.

Wekî yekemîn kovara akademîk a xwerû bi kurdî ku li Tirkîye û bakurê Kurdistanê derdikeve, kovara Zend di nav rûpelên xwe de cih dide gelek nivîsên bi her sê zarawayên serekî yê kurdî: Kurmancî, kirmanckî û kurmanciya jêrîn.

ZEND

ZENDÊKÎ KURDÎ YAN
DÎ 1 Nûmay 1, Hejm. 1997, S. 5

Di Kurmancî De
Mehmet Demir
"JAWA"

Aliyekî
Laurie Grace
"METAMATİK DUYATI"

Ava Welatê
Felat Dilgeş
"AVELATÊ BÊXWEDÎ"

Di Zarawayên Xwe
Enwer Qeredaxî
"ZULÛM 38'Î RA DIMA KÎ KÊM NÊBÎ"

Derwêşî Kirmanckî
Mehmet Salayî
"MÎHREKÊN MEHMET SALAYÎ"

Di Dema Selcûkî û
Osmanîyan De Ji
Dîroka Kurdistanê
Dîmenek
Şareza Aver

Di Kurmanciya
Jêrîn De
Mehmet Demir
"ZULÛM 38'Î RA DIMA KÎ KÊM NÊBÎ"

Di kovarê de nebûna redaksiyonê wekî kêmasiyekê balê dikişîne, lewre her nivîskarî li gorî xwe nivîsiye. Ew jî digel giranbûna mijaran dibê sedem ku gelek nivîs baş neyên fêmkirin.

Hûn dikarin kovara Zend ji navçeyên HADEP'ê, ji şaxên NÇM'ê û ji navendên çandê û ji Înstîtuya Kurdî bi dest bixin.

Navnîşana xwestinê:
Atatürk Bulvarı, Ceylan Palas Apt.
No:154/12 Aksaray
Tel: 527 19 11
Faks: 527 61 49

SERWISA ÇANDÊ

Bi cerê xelkê çûna avê şaşê

XURŞÎD MÎRZENGÎ



Bingeha romana kurdî wek hevîrê hilhatî hazir e. Îro em di nihêrin dewleta tirk di aliyê îdeolojî de jî û di aliyê siyasî de jî îflas kiriye, bûye pêkonek. Maskeya vê dewleta eşqîya ku xwe pê xurt û zexim dinimîne, ketiye û keçelê wan xuya dike. Heşt sed hezar leşkerên wan dike nake nikane bi Zarokên mala Zalê

Ev ketinên dewleta tirk bi saya serê zarokên kurdan yê canfida, bi teqîq û strajiyên jîr derketine holê. Şervanan efsane afirandine. Ev efsan bingeha romana kurdî ya nûjen in. Yanê romana ku kurd bi destên xwe binivîsin ev bi xwe ye.

Lê mixabin ez tîn û bala xwe didimê, rewşên bîrên kurd li bendê ne ku hinek biyan werin ji wan re vê romana payebilind, vê romana dewlemend binivîsin. Ji xwe di dîroka kurdî de, mirov rast tê ku wan hevî û

daxwazên xwe yê nivîsandîne sipartina biyanan. Lê em dibînin ku ew hevî û daxwazan her car şikestine. Tiştên hatine serê hirçê geliyan û gurên çiyân: Lê mixabin ew seysebat û bobelat nehatine nivîsandin.

Heke çend mîsyonerên biyan hinek ayet li ser birînen kurdan ê zelicandî û tavgeskî nivîsandibin jî, em dibînin ku wan berhem û misefehnan ji sedî yek jî birînen me derman nekirine û nikanin bikin jî. Romana kurdî pêwîst e ku bi zimanê kurdî û bi destê kurdan bête nivîsandin. Ne tenê pêwîst e, mecbûrî ye ku em bi vî zimanî, bi nexş û niqûşên kurdî bi destê kurdî binivîsin.

Îro me baş û qenc seh kiriye ku divê em bi destê xwe ayetên romana xwe, romana kurdî binexşînim û rengan li hev bînin. Ez bi xwe carinan didim ber hev û ji xwe re dibêjim: Gelo mirov porê keçikeye Ruhayî û simbêlên xortekî çiyayî bike ayetên romanekê de çî jê derê û de romaneke çawan be?

Lê îcar ez dizivîrim û ji xwe dipirsim: Baş e, de kî vî karê giranbiha bike? Baqên guliyên keçika Ruhayî de kî bipesinîne? Evîna bi dizî, ya di çavên wê yê reş belek de veşartî û ew dîmenên nermik û mîkewî ên hinarokên rûyê wê: Xal û xatên gerdenê, wan awirên kotelîn ku marê reş jî kunê tînin der. Heywax li mino.

Çawa de mirov kanibe bi vî dilê pînekirî bîne hubra pênuşê?

Simbêlên lawikê çiyayî û wan awirên wî yê sert, wek titûna binê malan, kî de salix bide? Bi kîjan zimanî de binivîsinê?

De were ji nava vê derayê kul û derdan derê. Ev ne karê şivanan e û ne jî karê gavanan e. Ev kar karê rewşên bîr û pênuşan e. Lê ez bal û xeyala xwe didimê, rewşên bîrên kurd û xwediyê pênuşan di vî warî de xwe telandîne û deng ji wan dernayê.

Sed heyf û mixabin, hêna jî rewşên bîr û ronakbîrên kurd lêkolînen xwe yê civakî, dîrokî û wêjeyî bi zar û zimanê biyanan, bi raman û çanda biyanan ayetan rêz dikin.

Heya kengê em de bi hespên biyanan bikevin cirîtê? Heya kengê em de bi kerê xelkê herin aş? Mirov bi hespê xelkê nikane bikeve hemberiyê û mirov jî kerê xelkê jî zû peya dibê. Heke sermiyana mirov ne jî kîsê mirov be, jî kîsê xelkê be, tu car mirov nabe bazir-ganekî baş û mirov nikane bikeve îhale û bazarên navneteweyî. Bi cerê xelkê çûna avê şaş e û du car şaş e. Banga min ew e ku em hemû dest bidin hev, pişt bidin piştê, vî zimanî û vî wêjeyê bidin pêş, şêrinî û tehdariya vî zimanî bidin eşkerekirinê. Ala wêjeya kurdî li banê Agirî biçikînin.

Strana bi meqama qareqarê

Di zemanekî de hirçek, gurek û roviyek dibin destbirakê hev û din. Xwarin û waxwarina xwe bi hev re dixwin; ger û nêçîra xwe jî dîsa bi hev re dimeşînin. Golikekê, mîhekê û karîkekê dikujin, êvarê bi dilekî kêfxweş her sê li hev rûdinin ji bo nêçîra xwe par bikin.

Hirç dibêje:

– Birayê gur de nêçîra me par bike, em bixwin.

Gur bi kêfxweşî, dilekî rihet û bi baweriyêke mezin dibêje:

– Birayê hirç, ma her tişt li meydanê ye, bi rastî ne hewce ye. Tu birayê mezin î, bila golik ji te re be, ez ji te piçûk-tir im, bila mîh jî ji min re be û rovi birayê me yî herî piçûk e, bila karîk jî ji wî re be.


Hirç çend deqeyan difikire û pişt re jî xwe diavêje ser gur, wî bi ser lepên xwe ve dike û davêje nav heriyê. Gur di nav heriyê de winda dike, tenê dêla wî xuya dibe.

Hirç îcar jî ji rovi re dibêje:

– Birayê rovi, ka tu par bike.

Rovi hinekî bi qurnazî difikire û pişt re jî dibêje:

– Birayê hirç, ma ji parvekirinê re çî hewce heye. Golik taştîya te, mîh firavîna te û karîk jî paşîva te ye. Heger hestiyê ji ber te ma, ezê jî wan bialêsim.



Hirç li ser van gotinên rovi kêfxweş dibe û dibêje:

– Ma birayê rovi, te ev dersa xwe ji ku girtiye.

Rovi carekê li dûvê gur yê rep, carekî jî li hirç dinhêre û dibêje:

– Erê birayê hirç, min dersa xwe ji dûvê gur yê rep girtiye.

Van rojan divê siyasetvanên tirk jî ji rewşa Zeyneba Zer û Xoce dersê bigirin.

Van jî xwest hinek daxwaziyên

MGK'ê paşçav bikin, lê leşkeran bi du brîfîngan pergala wan belav kir.

Serpêhatiya Zeyneba Zer niha dibe mijara filman. Li ba dek û dolabên wê filmên brazîlî xav û rijî dimînin.

Di tu filman de kes bir nabe ku qesr û qonaxa xwe li ser berdestiya xwe tapû bike. Her wiha tu senarîst ne ew qas jî in ku di film de çend qurîşên ku ji bavê serlistikvan jê re mane, bike çend milyar, heta trilyon dolar.

Rewşa Zeyneba Zer pêkenokek din

jî tîne bîra mirov. Roviyeke hînî rezekî bûye, diçe dikeve nava rez, tîrî bi mewan ve nahêle. Xwediyê rez dike nake nikare rovi di nav rez de bigire.

Wekî çare dafikê datîne ber rovi, rojekê rovi dikeve dafikê û ji ber êş û janê dibe qareqara wî. Di vê navê de kergoşkek di ser wî de tê. Kergoşkek dibêje:

– Çi bi te hatiye birayê rovi?

Ew jî li xwe danayine ku bibêje ez bi dafikê ketime, dibêje:

– Ez ji xwe re stranan dibêjin. Zeyneba Zer jî piştî ku bi dafikê ket, niha qareqara xwe wekî strana demokrasîyê nîşan dide.

Strana Zeyneba Zer

Por zer û çavbêl bû

Dilê gelek li ser kelakel bû

Bedewiya wê bûbû nîqaşa ser lêvan

Bû xemla komara hovan

Perdeya şermê qetand

Gelek kes dan kuştin

Bi hezaran gund şewitand

Ji bo xwe dizî, ji bo dewletê çek teqand

Ji bo baca şer, xwe li ber deriyê

xelkê pir leqand.

Go wê biqede, qediya bi xwe

Dema nekarî dilê artêşê bike şa

Niha bi girîn û hawarê

Stranan demokrasîyê dibêje

Ji meqama qareqarê

MÜCAHIT SEVER-QELEMŞOR


BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (75) XAÇEPIRSA

Ş	E	H	D	Z	W
A	M	E	A	R	F
L	E	M	K	E	S
P	W	E	B	A	Ş
Q	R	E	M	A	N
Ü	E	L	R	Ü	X
A	W	A	Z	I	R
A	S	T	B	I	
A	T	I	N	A	H
E	N	I	E	S	T

Bersiva Xaçepirsa 73'yan

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmeta me ya 75'an Pirtûta Haydar diljen (Ziwanê ma)'ye


Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa me ya hejmeta 73'yan pirtûka Celalettin Yöyler (Gelperwerî û Nîjadperestî) qezenc kirine. Selahattin Erol/ Mêrdîn, Mahmut Cengiz/ Hatay, Seydo Basmacı/ Ruha, Ali İmren/ Ankara

Jîn	Astrolojî	Bi tirkî hindîk	Zinê hespan	Kesê ku hespan	(berepaş)
Şehîdeke kurd (wêne)	Stranbêj	Rûbareke li misrê	(bi tirkî) Cinavkek	xwedî dike Pablo...	sembola neptun-yumê
				3	
Pêşbazîya erebeyan			Reng zer, zerik Pîvana Km²		
Razan	2				
		Notayek		Ûrtis	Notayek
		Qertala neyinyê			
Kurt			Hiç		
Sembola karbonê			Dijî ewrawî	5	Tipeke kurdî
				Xwedê gravî Heval, rêheval	
	Kes				
	...Tigran				
Av		Ar, arvan			
Pozitif	7	Nan		Rengok	
				Sembola osmûny-omê	
Şofêr					
Cinavkek			Ûfq		
	Dijwateya erê			Plaqeya Tirkîyeyê	

PEYVA VEŞARÎ





* Leskeran fermona
Giler ji rakir:

Tevkujiya Sêwazê nayê jibîrkirin

37 rewşenbîr û hunermend ên ku çar sal berê li Sêwazê di Hotela Madimakê de hatibûn şewitandin, piştî çar salan jî li bajarên cur bi cur bi gelek çalakî xwepêşandanan hatin bibîranîn.

Çalakiya herî mezin roja 2'ê tîrmehê li Enqereyê bi beşdariya 50 hezar kesî li ser "Pira Sihiyeyê" dest pê kir. Emniyeta Enqereyê, li gelek deverên mîna "Parka Abdi İpekçi", li dêrdora Pira Sihiyeyê û li Qada Tandoğanê bi şeweyekî berfireh hêzên xwe civandibûn, piştî jî polîsan bi bariyeran Bulvara Celal Bayar kirin du beş da ku girseya gel cuda û qel bibe. Di mitîngê de zêdebûna komeleyên alewîyan bal dikişand ser xwe. Partiyên wek HADEP, BP, CHP, DBP, SİP, EMEP, İP û ÖDP bi pankart û alên xwe beşdar bûbûn. Ji bo mitînga Enqereyê, ji bajarên Edenê, Mersînê û Tarsusê jî, ji du hezarî bêhtir kes beriya ku herin qada mitîngê, çûn goristana Karşıyakayê û gorên kesên ku li Sêwazê hatibûn qetilkirin û gorên Deniz Gezmiş û hevalên wî ziyaret kirin.

Berî ku mitîng biqede di navbera İP'ê û ÖDP'yê de ji ber şedema cih pevçûn çêbû û 5 ji wan polîs 20 kes birîndar bûn. Serokê Komeleya Pir Sultan Abdal Murtaza Demir, ji DİSK'ê Tayfun Gürgün, Serokê KESK'ê Siyami Erdem di mitîngê de axivîn û qetlîam protesto kirin.

Her wiha li Stenbolê, li Goristana Zincirlikuyu Hozan Nesimî Çimen û wejevan Asım Bézirci li ser gorên wan ji hêla Platforma Azadî û Gelan (Halklar ve Özgürlükler



Platformu) hatin bibîranîn. Sendiqaya Belediye-İş'ê jî li "Parka Fatihê" qetlîam bi daxuyaniyê çapemeniyê şermezar kir. Dîsa li taxên mîna Okmeydanı, Gazî û Ümraniyê jî gel bi çalakiyên xwe tevkuji protesto kir, da zanîn ku wan şehîdê Sêwazê ji bir nekirine.

Her wiha li Sêwazê, li ber Hotela Madimakê ku qetlîam li wê derê pêk hatibû, Platforma Demokrasiyê ya Sêwazê daxuyand ku ew qetlîan nas dikin û ew tu çar wan jî bir nakin. Her wiha Hunermend Haşret Gultekin li navçeya İmrenliyê, li gundê Xanê li ser gora wî hate bibîranîn.

Li bajarê Edeneyê jî HADEP, ÖDP, KESK, İHD û Genel-İş daxuyaniyê hepar

dan. Di daxuyaniyê de gotin ku ew qatilan şermezar dikin û kesên ku hatine qetilkirin ew bi hurmet bi bir tînin.

Her wiha qetlîam bi daxuyaniyên Odeya Tabîban a Edeneyê TMMOB û Odeya Mîmaran hate şermezarkirin.

Li bajarê Meletiyê jî Komîsyonan jinan a HADEP'a Meletiyê û Komîsyona Xortên bi hev re daxuyaniyê bi nivîskî belav kirin. Di vê daxuyaniyê de tê gotin ku bi taybetî ew Qetlîama Sêwazê û tevahiya qetlîamên ku pêk tên şermezar dikin. Her wiha BP'ê jî bi daxuyaniyê bûyer protesto kir.

NAVENDA NÜÇEYAN

alax: sixûr, ajan
balafirgeh: havaalanu
balyozxane: Konsoloxane
berguman: bersûc (sanîk)
berbijarkirin: pêşniyazkirin, nişandin
bêmîrê: lewîfî, qirêj, qilêr, kirêr
birînteroşk: bandaja birînê
bizav: tevger, hereket
bobelat: felaket, bela
çespendin: teyidkirin
dengkuj: dengbîr (susturucu)
eger: sedem, sebeb
firîrok: bafirok (uçurtma)

Ferhengok

gerdûnî: universal (evrensel)
gemas: qehreman; leheng, egîr, nebez
geşt: ger, seyahat
girov: nişane (belirti)
hemolî: hemdîn (dîndaş)
herifandin: pelîşandin, rûxandin
hevrik: reqîp
hêwirîn: li cihêkî jiyîn
kutakirin: qedandin, tevakirin, xelaskirin
lay: alî, mil, teref

lihevbanîn: hînihevbin
merixîn: mexel bûn, ketin (çörmelmek)
metirîs: xem, endîşe
navberî: navber dîtin
pelandin: kontrolkirin (yoklamak)
pergal: nîzam, sazûman (düzen)
pêşander: beşdarê mitîngan
rasteder bûn: derket holê, xuya bûn
rêzdar: birêz (sayın)
rikeber: dijber, muxalîf
şalyar: wezîr (bakan)
têvel: aloz, tevlîhev
zêrevan: çavdêr (gözlemci)

GÜNDEMİNİZ DEĞİŞECEK



Wê rojeva we bê guhartin



TEMMUZ 'da bayilerde

Ülkede

GÜNDEM

Günlük Gazete